

ARMANC
Jî mehê
carekê
dertê
Hejmar: 101
Sibat
1990
Buha: 10 Skr.
3 DM

Armanc

SERXWEBÜN DEMOKRASİ SOSYALİZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 101
February
1990
Price: 10 Skr.
3 DM

Li Mêrdînê Mektebên Kurdi



"Teyareyi duzmin, Ay ay teyareyi duzmin..!"

Mamoste Hikmet Hîrîri: "Pêçebûnen me kêm in; tiştek nîne, ne pirtûk, ne qelem, ne defter ne jî cih. Zarok gelek in û çadir piçûk in. Zarok li erdê, li ser betaniyan rûdinên. Çadir bi agirê sobê germ nabin. Daxwaza me ji birayên me yêndi Kurd, yêndi li Ewrûpayê ew e ku ji me re qelem, defter û eger hebin pirtûkên Kurdi bîhinêrin. Eger hinartina van tiştan zahmet bit, ew dikarin pera birêkin ku em ji vir bikirin."

Nûçeya wê di
rûpela 2'an de

Ji 16 dawayê berpirsiyarê Medya Guneşî dawek xelas bû:

6 sal û 3 meh ceza, cezayê din jî li pê ne !

Piştî 12 sal û 6 meh cezakirina
xwediyê kovara Medya Guneşî
Cemal Ozçelik îcar jî Mahkema

Ewlekarîya Dewletê a Stenbolê di
12'ê Sibatê de 6 sal û 3 meh ceza
da berpirsiyarê kovarê Yakûp Ka

rademîr. Ceza ji nivîsa hejmara
5'an ku bi navê "12 Eylül Dos-
yasi" (Dosya 12'ê Îlonê) ji alî
nivîskarê kovarê Behram Arda ve
hatibû nivîsandin, hat dayin. Ji
xeynî wê cazeyî hîn 15 dawayê
Yakûp Karademîr hene ku ji van
6'ê wan di Mahkema Ewlakariya
Dewletê (DGM) û 9'ê wan jî di
Mahkema Aslîyê de ne. DGM li
dawêni 141, 142 û Mahkema Aslîyê
jî li qanûna 2932 ku zimanê
Kurdî qedexe kiriye, dinêre. Piştî
ku ev dawe xelas bibin wê Y. Karademi
bi sed salan ceza bistîne.

Awûqata Yakûp Karademîr Eren
Keskîn li ser cezakirina Yakûp
Karademîr got ku "Êdî ezê hew di
mahkemê de mudafa muwekilê
xwe bikim, piştî ku ceza li Yargitayê
(Mahkema bilind) jî hat tes-
tîqkirin, ezê muracatî Komsiyona
Mafê Însanî ya Awrûpayê
bikim."



Awûqata Yakûp Karademîr Eren Keskin: "Ezê muracatî
Komsiyona Mafê Însanî ya Awrûpayê bikim."

Li ser çanda Kurd Konferansek navnetewî

Di 23, 24 û 25'ê Adarê de li İtalyayê li bajarê Floransa wê
konferansek navnetewî li ser çanda Kurd bê çêkirin. Konferans
ji aliye belediya Floransayê tê organîzekirin.

Ji bo konferansê gelek pisporên biyanî û yêndi Kurd hatine
vexwendin. Tevger û Cepha Kurdistanâ Iraqê jî di nav wan
kes û rêtixistinan de ne ku hatine vexwendin.

Roja pêşî ya konferansê wê li ser rewşa Kurdistanê ya
siyasi be. Roja duemîn û sêemîn jî wê li ser çand û tarixa
Kurdistanê be.

Bavê Nazê

Kî ji devê de ketiye
û hop-hop jê tê ?

rûpel: 3

Ferhad Çeleng

Di rewşa îroyîn de jî
di têkoşînê de
wezîfeyê netewî û çinî
bi hevûdû ve girêdayî ne

rûpel: 4

Rojeva Melne

Dersêni ji welatêni sosyalîst û tecrubêni Nîkaraguayê

Di hilbijartinê Nîkaraguayê de Cepha Sandinist û serokê wê li hember tifaqa muxalefetê ku DYD li pişte bû wenda kir. Tevgera ku bi şoreşek şerê çekdarî hatîb ser hukum, pişti 11 salan dîvê bî hilbijartinê, seroktiya welêtî xe destê muxalefetê.

Helbet bi idareguherîna encama hilbijartînê meriv nikare bêjê ku şoreş û qazancê şoreşê têk cûn. Çimkî rehê şoreş di welat de di warê abori, cîvâki, siyasi û kulturi de kür xwe bera erdê dane, ne hesan e ku bi guhertinek netica hilbijartînê ji kokê de bêni hilçinîn. Lî disa ji netica vê hilbijartînê, di warê navnetewî de gelek bal kışand ser xwe û dibe sedemên gelek munâqesan. Her kesekî şoreşger, welatparêz, azadixwaz û pêşkeftîxwaz wê pîrsê ji xwe dîke ku gelo çawa bû ku piraniya dengdayen Nîkaraguayê, dengê xwe nedan niminendê şoreş û azadiya Nîkaraguayê, lê dan mutefikîn Amerikayê.

Helbet em bi dûrûdirêji nizanîn ka gelo ew xusûsiyeîn taybeû yên civaka Nîkaraguayî û yên siyaseta Sandinistan ci bûn ku rê li ber windakiriana hilbijartina vê cephê vekirin, lê hin xusûsiyet hene ku ci rast û ci ji cep hemû cihan hay jê heye ku bûn sedemên esasi yên encama vê hilbijartînê; ew ji ew şerê çekdariyê 11 salan e ku DYD bi riya Kontrayen xwefiros li dîjî gelê Nîkaraguayê dimeşine. Ne ew tenê, wê ambargoya abori ya ku Amerika, ev 11 sal in li hember vi gelî li dar xistiye, aboriya welat serûbini hev kiriye. Gelê Nîkaraguayê bi salan li dîjî diktatoriya Somoza ser kir, ew ji ser hukum xist ku bibe xwediyê serbestî û azadiya xwe, ji kedxwiri, zordarî û bêrûmetî xelas bibe, bigihîje aşû û aramîyê. Lî hê ber xwe nedî Amarikayê bi wasitên çekdarî, abori, siyasi û diplomasî şereki gîran li wan rakir. Di van 11 salan de 30 hezar kes hatin kuştin. Sinaiya Nîkaraguayê têk cû, çandînî ji berê xerabir bû. Buhayî, bêkarî û birçibûniyê bînh li xelkê çikand. Bilindbûna enflasyonê, sala par gîhaft %35 hezaran, îsal gîhaft %18 hezaran. Èdî taqt, sebz û tehamula xelkê ji ber ser û birçibûni, tuneyî û bêkariyê nemabû. Xelkê bi vê hêviyê dengê xwe dan muxalefetê ku belki piçeki bîhna xwe vedin. Ji alî din di dema propaganda hilbijartînê de, tê xwiyakîn ku Amarikayê gelek alîkariya peran ji bi muxalefetê re kir.

Tevi ku Cepha Sandinist di hilbijartînan de winda kir ji, Daniel Ortega di beyana xwe ya pişti hilbijartînê de da diyarkîn ku pêkhatîna hilbijartînê serbest bi xwe zaferêk nû ye ji bo Sandinist. Helbet ev peyva han ne bes ji bo moralbilindkirina alîgirîn Sandinist e, para rastiyek muhîm ji di vê de heye. Çimkî Sandinist û gelê Nîkaraguayê hîn di destpêkê de ji bo azadi û serbestiya civakê ser kiribûn û xwîna xwe rijandibûn. Nexwe dîvê ev azadi bihata bicikirin, wek hin derêni din nedibû ku bi navê idealîn mezin diktatoriya kêmasyekê bihata lidarxistin. Ji alî din ve, para zaferê di wî %40,8 û dengan de ji heye. Mana wê ew e ku nêzi her ji du kesan kesekî, tevî wê rewşa dijwar a welat û kampanya emperyalizmê ji dengê xwe dan Sandinist. Li hember hêzek wiha ne hêsa ye ku hêzen kevnoperest û emperyalîst civakê ji azadi û demokarsiyê bêpar bîhelin, di nav lepê xwe de bigevizînin.

Lê li alî din vê hilbijartînê û rewşa Nîkaraguayê ya 11 salan da diyarkîn ku, xetera emperyalizmê û daxwaza wê ya hegomanîya li ser gelên cîhanê, ne xeterêk piçûk e, gelek û gelek ji mezin e. Şerê serxwebûnê, azadi, demokrasi û sosyalizmê, nabe ku hisyariya xwe ya li ser hegemoniyâ, diktatorî û kedxwiriya emperyalizmê û sermiyandariyê sist bike. Demokrasi, azadi û sosyalizm bê vê kulek e. Çimkî ev wezîfe him ya netewî û him ji ya navnetewî ye.

Eger em ders û ibretêni ji welatêni sosyalîst û tecrubêni ji Nîkaraguayê karîbin bîhînin hev û perspektif û prensibîn xwe bi wan ava bikin, eme pirtir nêzi serkeftinê bibin. Lî ku em yekali xwe bîspîrin her yekê ji wan bîvê nevê têkoşina me wê kulek be.

Li Mêrdînê Mektebêni Kurdi

□ F. Hirorî

Tevî tehdît, gef û berlégirtinê hûkûmeta Tirkîyê ji li kampa Mêrdîn, Kurdîn penaber(multecî) bi imkanîn xwe û alîkariya Kurdîn Diyarbekir, Mêrdîn, Kiziltepe û bajarê din xwendeghehê Kurdî vekirin. Di xwendingehan de 2300 zarok dixwînin, 55 keç û lawêni Kurd mamostatiyê dîkin. Berî niha Kurdîn penaber yên li Diyarbekirê daxwaza vekirina xwendeghehê Kurdî kiribûn, lê hûkûmeta Tirkîyê bi tundî li dîjî vê daxwazê rawestiyabû û ji wan xwestibû ku ew zarokêni xwe bişinîn mektebêni Tirkî.

Penaberêni Kurd, yên li bajarê Mêrdînê, wek yên li bajarê din, ji bo jiyanek insanî li ser têkoşina xwe berdewam in. Wek tê zanîn heta iro ji Tirkîyê pişta xwe daye hemî daxwazêni wan yên ji bo başkîrina jiyana wan. Lî Kurdîn di kampan de li ber xwe didin. Yek ji awayen vê berxwedanê di destpêka meha yekê ya vê salê de tevî pêşîlegirtin û tehdîdên hûkûmeta Tirkîji bi ser ket û panaberêni li Mêrdînê bi hebûn û imkaniyeten xwe yên sinorkirî û bi alîkariya xelkê Diyarbekir, Mêrdîn, Kiziltepe û Kurdîn din, li kampa Mêrdînê xwendingehê Kurdî vekirin. 55 keç û lawêni Kurd ên mamoste, yan yên ku xwendina bilind xilas kirine, di mekteban de mamosetiyyê dîkin. Di hemû mekteban de sinifên 1, 2 û 3 hene û 2300 zarokêni Kurd lê dixwînin.

Mektebêni me çadirêni me ne

Mamostê mektaba Kurdî Ezîz Malî li ser rewşa mekteban weha dibêje: "mektebêni me çadirêni me ne. Materyalîn me kêm in. Berî her tişti pirtûkîn bi Kurdî nînin. Qelem, defter û tişti din ji bi imkaniyeten me bixwe û harîkariya Kurdîn Tirkîyê têne peydakirin."

Mamosteyekî din; Hikmet Hirorî ji qala kêm imkaniyetan dîke: "Pêşebûnîn me kêm in; tiştek nîne, ne pirtûk, ne qelem, ne defter ne ji cîh. Zarok gelek in û çadir piçûk in. Zarok li erdê, li ser betaniyan rûdinê. Çadir bi agirê sobê germ nabin.



Xwendingeha Paşerojê

Daxwaza me ji birayen me yên Kurd, yên li Ewrûpayê ew e ku ji me re qelem, defter û eger hebin pirtûkîn Kurdî bihînîrin. Eger hinartina van tiştan zahmet be, ew dikarin pera birêkin ku em ji vir bi-kirin."

"Mamo ji min re qelemê rengîn bîne"

Ne tenê mamosta, lê zarok ji bi nebûna qelem û defterâ dihesin. Dema ez li mektebekê (çadir) bi mamostayen re dipeyivîm, keçke 9-10 salî nêzîkî min bû û got: "Mamo cara dî ji min re qelemêt rengîn bîne!"

Aliyekî din yê meselê: Tehdit

Mamosteyekî din çeli aliyekî din yê mesela mekteban dike: "Ya rastî ew e ku em ji pilanê Seddam û ji yên Tirkâ ditirsin. Em dizanîn ku ji roja pêşî heta iro Iraq û Tirkîyê pilana li ser me digerînin. Bêguman bi taybetî Tirkîye ji vekirina xwendingehê Kurdî gelek aciz e. Li Di yarbekirê nehîştin ev daxwaza Kurdîn penaber biçe serî. Vêca xwendingehê deyne layekê, Tirkîye naxwaze em li vira bîmîn. Iraq dixwaze bi ci rê be, me bibe Iraqê ku dimahîka vî tişti ji bo me hemîya mirin e. Em hêşta di çadiran de ne, mafê pen-

me yên Kurd yên li Ewrûpayê harîkariya maddî ji bo me nekin, çedîbit ku xwendingehê me ji bê imkaniyeti ji bêne girtin. Çavêne me li riya harîkariyê ye."



"Mamo ji min re qelemêt rengîn bîne"

Ji kolonyalîstan hewla getlîamek nuh

Dîsa 3000 Kurd jahrdadayî kirin

Li kampa Diyarbekir, roja 1'ê Sibatê, piştî nanxwarinê bi sedan Kurd jahrdadayî bûn. Korîdorên nexweşanên Diyarbekir ji nexweşan tiji bûbûn.

■ Xelkê Diyarbekir ev pîlana qetilkirina bi sedan Kurdi bi tundî protesto kir

Roja 1'ê Sibatê, li kampa multecîyên Kurd a Diyarbekir, piştî belavkirina nan bi sedan Kurd jahrdadayî bûn. Li gor agahdariyên ketine desten me, 3000 Kurdên multecî ji ví nanî tesîr dîtin û di nav wan de rewşa 500 kesî giran e. Heta ji wan du kes mirin ji.

Dewleta Tirk ji bo vê qetiliama han veşere bi devê waliyê Diyarbekir Cengiz Bulut da beyan kirin ku xwedîgiravî nan kevn bûye. Lî serokê Komela Tabîbên Diyarbekir Abdulselam Yuksel ev iddia walî derew derxist û da xwiyakirin ku di nav nan de hin girêkên xerîb hatine dîtin.

Ev yek ji aliyê gelê Diyarbekir ve bi tundî hat protestokirin. Di roja 3'yê Sibatê de li dor 2000

kes civiyan û meşîyan ber bele-diyê û li wir bi slogan û axaftinan failen vê qetiliamê û berpirsiyaren dewletê protesto kirin. Polis û leşker di şuna ku herin failen bûyerê bigrin, rabûn hin besdarên misîngê girtin. Di roja 10'ê Sibatê de Devrîmci Demokrat Gençlik (Xorten Şoreşgerên Demokrat) bi meşke girseyî bûyer protesto kirin û pûl bi diwaran ve zeliqandin. Polis 19 kesîn besdar girtin, qismek ji wan rotirê berdan.

Platforma Demokratik a Diyarbekirê li ser vê bûyerê belavokek belav kir û failen bûyerê lanet kir. Komela Mafê Mirovî ya Diyarbekir ji bi belavokekê bûyer protesto kir û weha got: "Li gor texmîna me armanca vê senaryoyê

ew e ku çavên Kurdên di kampan de bitirsînji bo ku Tirkîyê terk bikin."

Li Almanyayê li bajarê Hamburgê roja 17'ê Sibatê alîgirên PPKK, PUK, PDK-Î, PGDK, KOMKAR, HEVKAR û gelek hêzên din bi meşekê bûyerâ kampan Diyarbekir protesto kirin.

Wek tê zanîn par, di meha Heziranê de jî 3000 multecîyên kampan Qiziltepê jahrdadayî bûbûn û faîlen wê bûyerê jî kifş bûbûn ku sîxurên Iraqê ne. Hukumeta Tirkîyê jî şîrikê Baasiyan e. Hukumeta Tirkîyê dixwaze rojekê beriya rojekê ji van Kurdên multecî xelas bibe.

□

Kongra 10-em ya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê



FOTO: Sarko Amin

Di navbera 10 û 11'ê Sibatê de bi besdarbûna 119 nûneran ji 27 komelêndamê Federasyonê, Kongra 10'em ya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê li Stockholmê çêbû.

Di herdu rojê Kongrê de bi dûr û dirêjî li ser kar û barê Federasyonê hat axaftin û li ser pirs û pirsegirekên civata Kurd ya Swêdê hat rawestandin.

Serokê kevn yê VPK Harmanson, Parlamentera Partiya Modernat Inger Koch, ji Daïra Biyaniya Hansson û li ser navê Komîta Piştgiriya Mafê Kurdan ji Maria Munter di kongrê de axiftin û piştgiriyan xwe ji gelê Kurd re pêşkêş kirin.

Serokê Federasyonê yê kevn Kaya Ízol dîsa wek serokê Federasyonê hat hilbijartîn. Ü Komîta Kargêr ji wan kesan pêk hat: Hesen Mizgin, Vildan Tanrikulu, İbrahim Çorapçi, M. Abdülrezak, Ahmet Qaramûs û N. Kirîv.

Biryarê Kongrê

◆ Kongra 10'em zordestiya dewletên dagirker Tirkîyê, Iranê, Iraqê û Sûriyê ya li ser gelê me ku bê nabêñ berdewam e, bi tundî mahkûm dike û piştgiriya xwe ji

bo tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê nîşan dide.

◆ Kongra 10'em şehîdkirina Dr. Qasimlo bi destê rejima kevneperest a İranê mahkûm dike û ji hukûmeta Awusturya doz dike ku berpirsiyaren vê terorê bi lez derxînin û ji bo cihanê ilan bikin. Her weha Kongra 10'em piştgiriya pêşniyara nîşandina Dr. Qasimlo ji bo xelata aşitiyê ya Nobelê dike.

◆ Kongra 10'em, piştî 27 salêni di zîndana rejima nijadperest a Afrika Başûr de, serbestberdana serokê ANC; Nelson Mandela pîroz dike.

◆ Kongra 10'em piştgiriya xwe ji bo 5 parlamente û Kurd nîşan dide, ji ber ku parlementoya Tirkîyê dixwaze mafên parlamente riya wan ji holê rake.

◆ Kongra 10'em biryara nû ya hukûmeta Swêdê, li ser guhertina qanûna biyaniyan protesto dike û daxwaze dike ku Federasyon xebateke xurt ji bo pîrsen penaberên Kurd ku li Swêdê ne, bimeşîne.

◆ Kongra 10'em, biryara da ku Federasyon divê ji bo zarok, ciwan û jînîn Kurd li Swêdê xebateke hîn xurttir bimeşîne û hewl bide ku ew di xebata demokratik de baştir cihê xwe bigrin.

Li Norveçê Federasyona Kurd

Di civîna xwe ya yekemîn de 5 komelêndamê Kurden ku Federasyonê avakîrin armanca vê gava girîng, weha dan diyarkirin: "Ev biryar wê têkiliyên navbera gelê Kurd û Norveçîyan û hukûmeta wê xurttir bike û herwisa ji bo yekîti û piştgiriya Kurdan ji wê xebatê pêş ve bibe û wê bibe hîmekî xurt.

Wê Federasyona Kurd mil bide têkoşîna gelê Kurd a bi heq ku li Kurdistanê bê rawestan dom dike û ji bo wê, raya gişî agahdar dike û piştgiriye dixwaze. Federasyon, ji bo çareserkirina pîrsen civakî û çandî wê bi aktûfî bixebite. Ji bo vê yekîti wê têkiliyên xwe bi Kurden Ewrûpayê re xurt bike û bi rîexistinê penaberan re bixebite.

Federasyon, her çigas hatîbe damezrandin ji lê hîn wek mueseseyekê, bi organ û bi xebata xwe rûnenîstiye. Ji bo vê yekîti wê bahara pêş me civînek bê çekirin.

Kî ji devê de ketiye û hop-hop jê tê ?

Bavê Nazê

Pêla xwendevan navê berpirsiyare partiyekê li bin meqalekê dibîne, seraser hîviya ku wê tiştekî nuh û orjinal bixwîne, dike. Lî ku ew pêrgî nûce û gotinê derew, ku her kes pê dizane dibe, ji xwe dipirse; gelo çîma xwedîyê nîvîse ava rûyê xwe naparêze û xwe bêdeng nahêle? Ma qezenc ji gotinê vala heyel?

Meqala Selah Bedredîn (Kurdistan Press hejmar 78), di warê valahiyê de nimûne ye. Lî di ser vî half de ji, ew bi ji xwe razîbûnek bêbingeh û bi payetiye bêmane dinîvîse. Ew bi rengekî wiha li ser xwe dinîvîse, fena ku merovek bi tena serê xwe ji cengê bi serkevtin derketibe. Û hêzên din ji bi tirsonektiyê û bi bêkêrîtiyê dide xwiyakirin. Herçî em, em pê dizanin ku serok Selah, ji Kurdan re tu kela fetih nekiriye û pozbilindiya wî ji valahiya wî tê. Ma ne Kurdan hîn ji mîj ve gotine: "Sinbilê genîm ê vala bi ehmeqî serê xwe radike û yê dagirtî bi tewaziî serê xwe diçemîne."

Gelo xwendevan dikare ci di meqela serok Selah de bixwîne? Helbet emê nikarbin nîvîsa wî neqlê van rûpelan bikin. Lî belê em mecbûr in ku naveroka wê bi kurtî, careke din serê we pê bişînin: "Kurd heta niha bê maf mane. Rewşa wan, ji 40 salî û vir de hinekî hatîye guhertin. Mafê Kurdan ji bi jiyanê heye. Li Kurdistanê, çilo burjuwazî û karkir hene, her wilo ji çep û rast hene. Divê xebat ji bo mafên Kurdan bibe."

Li gora vê mantîqa sivik merov dikare, di şuna meqalekê de di hundîre rojekê de pirtûkekê binivîse: "Di civaka Kurdi de jîn û mîr hene. Kurdistan car perçye ye. Tevgera Kurdi geh xurt dibe, geh qels dibe. Heyamên berê Kurdan kêm dixwendin. Berî ku Selah Bedredîn ji welat derkeve gepa nan li mala wî tunebû, lê nuha bi dolaran dilize û hwd."

Ma kî bi vê rastiyê nîzane?

Selah Bedredîn li gora gotinê xwe yê absurd, bi pîvaneke bêmane hêzên Kurdi bi vî rengî dipîve:

1-PKK xwe tenê şoreşger dibîne û bi kesî re yekîtiyê naxwaze (Ma tu dixwazî?)

2-Hêzên TEVGERê ji ber qelsbûna xwe gîhîstîn hev (Ma tu ji wan xurttir i?)

3-Eniya Kurdistana Iraqî li Sûriyê û li Îranê hatîye damezirandin (û hizretê te li ber deriyê kî ye?)

4-PDK-îranê xwe dûri xebata Kurdistanê dike (Hemî ji Xwedê re tu geleki nîzîki wê yî)

5-Partiyê Kurdistana Sûriyê, doza serxwebûnê nakan (Ma kî nîzane ku tu doza serxwebûnê Filistînê dikî?)

Divê meriv bextê xwe xira neke û bûbêje, meqala Selah ne heya dawiyê vala ye. Tiştên balkêş ji tê de hene. Bi xwe rengî nîvîse geleki bala min kişand. Wî meqala xwe bi tonê raporan nîvîsiye. Diyar e Selah wilo fêri nîvîsa raporên sîxvîyê bûye, heya nikare di meqala xwe de ji, xwe ji bin tesîra wan xilas bike. Ez na-xim bextê xwe, lê merov texmîn dike ku teqîma wî ji hêzên me re, ji ber reportan hatîye girtin. Ev tiş, ji bilî forma nîvîse, di warê ziman de ji tê xwiyakirin. Hewokên wî gotin bi gotin ji ber zimanê Erebî hatîye girtin. Loma ji zimanê wî bi Kurdi pirr çewt û xwar e.

Di meqala xwe de, Selah Bedredîn tiştekî din ji rewîşîn xwe ji merov re dide xwîya kirin. Ew ji mîrxasiya wî ye. Dibe hûn bipirsin, mîrxasiya ci û halê ci? Ez ji, ji we dipirsim: Ma ne mîrxasiye ye, dema merov bi xwe pesnê xwe bide? Bi rastî ji mîrxasiyek bêhempa ye; pêla merov sîxur be, lê bi xwe qala sixuriya xelkê bike, dema ew qels be, qala lawaziya yê din bike û gava ew meriv be, çêli nezaniya zanan bike!

Erê, heger Selah Bedredîn ne mîrxas bûna, ma wê li der û doran zerfa tije dolar karîba daniya ber xwe û ji Kurden me yê rûnişti re bigota: "Hûn hemû li ser hesabê min...."

Û tiştekî din; Selah Bedredîn navê meqala xwe kiriye: "Çekê me Yekîti ye" Lî di hundîre meqalê de, tenê heqareta hêzên Kurdi dike. Wan geh lawaz dibîne û geh wan girêdayî dibîne. Îcar xwendevan ji xwe dipirse: "Gelo Selah yekîtiyê bi kî re dixwaze?"

Heger a rastiyê em ji hev re bêjin; emê bêjin ku Selah Bedredîn tu carî yekîtiya Kurden naxwaze û ji Xwedê dua dike ku kevirekî Kurdistanê li ser hev nemîne da ku ew kîfxweşîya xwe li Ewrûpa bike û bidomîne.

Û pirsek; gelo çîma Selah Bedredîn girê xwe di hêzên me dide? Diyar e ew ji hêzên me bê hêvî bûye û naskiriye ku ew ê nanê xwe pê re di xwîna mîletê me danekin. Wilo ji belî ye ku ferman jê re ji jor de hatîye, da ku ew heqareta partiyê Kurdistanî bike.

Bi xwe ez lomê ji Selah nakim. Ji ber ku ew karê xwe dike. Lî loma min ji partiyê me ye. Gelo çîma wî dihewîn nav xwe? Diyar e partiyê me gotina pêşîya ji bîr kirine: "Merovê kotî yê li dora xwe ji kotî dike." Ji bo destheramiya Selah Bedredîn, gotna dawî, divê endamîn Partiya Hevgirtina Gel bibêjin...

Heya vira nîvîsa min bi dawî tê. Lî tevî wiha ji ez, nikaribim du pîrsen din ji nekîm; gelo di nerîna Selah de kî ne ew kesen ji devê ketine û hop-hop ji wan tê? Bi xwe ez dibêjim; şeko navê xwe li hevalê xwe ko!" Û pîrsa din: Gelo çîma merovê ku xaniyê wî ji camê be, kevira davêje ji xaniyê çimento de? Diyar e, bi rastî ji dema ecela bizinê bê nanê şivîn dixwe!

RAMANÊN RAMANWERAN

Di rewşa îroyîn de jî di têkoşînê de wezîfeyên netewî û çînî bi hevûdû ve girêdayî ne

□ Ferhad Çeleng

Iro li Kurdistanê têkoşîna netewî û civakî roj bi roj geş dibe, pêşve diçe. Li Kurdistanê şiyarbûyinek her diçe xurt dibe. Di warê aktuelbûyina mesela gelê Kurd de him li Kurdistanê û Tirkîyê, him jî li derveyê welat gelek bûyerên nuh têni holê. Ev tiştîn ku li ser axa Kurdistanê çê dibin, tesireke baş li ser navnetewibûyina meseleya netewa Kurd dike.

Li dinê jî gelek bûyer, guherandin û tevlîhevî çê dibin. Carna seet bi seetê namîne. Merheleya ku bi perestroyka û glasnostê destpêkir, her roj ber bi belavbûna sistema sosyalizma reel diçe. Rewşa welatên sosyalist ket merhelekê ku li hinek welatan, komunist ji huwiyyeta komunîstiyê direvin, parti xwe fesh dîkin û dibin sosyal demokrat. Meseleya Almanyake yekbûyi hema hema hel bûye. Almanyaya Rojava û welatên emperyalist, "bêteref" bûyina Almanyaya yekbûyi qebûl nakin. Yanî, munaqaşe li ser karekterê sistema civakî û iktîsadî nemaye û Almanyaya yekbûyi ewê kapitalist be. Lî bûyerên ku berdewam in, rî didin ku, ihtiîmala mezin endametiya NATO jî ewê were qebûlkirin.

Yekîtiya Sovyet jî, her roj ber bi têkçûnê diçe. Meyla komaran ber bi kapitalizmê û serxwebûnê ye. Carna partiyen komunîst ên komaran hewl didin ku, gel hevûdu bikuje. Li hinek komaran komunist, bîyi komunîst bi her tiştî dimînin. Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyet, berê dixwest tiliya xwe têxe nav her tiştî, lî iro li hember têkçûna sistema sosyalist, çûyîna ber bi guherandina dengeyîn siyasî, aborî û eskerî yên dinê, serê xwe kiriye bin qûmê. Meriv dibê qey enternasyonalizm çûye, neteweperestî hatiye.

Ev hemû tiştîn ku li cihanê dibin, bê şik li tevgera rizgariya Kurdistanê tesîr dike. Çawa ku ji Şoreşa Oktobrê heta şoreşa Nîkeraguayê, hemû pêşveçûnê netewî û civakî tesîra xwe li ser têkoşîna gelên bindest hîst, iro jî, helnekirina problemen siyasî, iktîsadî, netewî û hwd; bi navê helkirina probleman ber bi têkçûna sistema sosyalist çûyîn, paştevegerandina kapitalizmê û hin bûyerên ku di vê merhelê de têni holê, tesîra xwe ewê li ser têkoşîna gelên bindest bike. Û Kurdistan jî wek welatekî bindest ewê ji bûyeran para xwe bigre.

Di vê qonaxê de wezifeyên herî giran wê li ser milê sosyalistên Kurdistanê bin. Ji bo ku merheleya ku li Kurdistana Bakûr em têde ne, ji me, ji sosyalistên Kurdistanê, ji gelek aliyan ve midaxaleya şoreşgerî dixwaze, gerek em li hemû meseleyen têkoşîna netewî û civakî xwedî derkevin.

Ez bi xwe, ji revandina munaqşeyen bûyer û guhertinênu ku li dinê dibin xetereke neteweprestî dibinim. Û ev telûke ji bo perspektifên şoreşa Kurdistanê jî, kare ji gelek aliyan de talûkeke mezin be. Û kesen ku bi navê komunîstî vê meylê diparêzin ez bawer nakim ku ewê bikaribin di wextek dûr û dirêj de huwiyyeta komunîstî biparêzin.

Bûyarênu ku li dinê dibin, gerek nebe sebebê ku em xwe ji meseleyen tevgera komunist a dinê dûr bixînîn, di warê netewî û navnetewî de wezifeyen xwe yên çînî neynîn cî an jî ihamal bikin. Rast e, bûyerên ku li dinê dibin gelek zahmetian derdixîn ser parastina perspektifên çînî û huwiyyeta sosyalistî. Û emperyalizm bi hemû riyan ve dixwaze gelên dinê iksna bîke ku, sosyalizma ilmî, komunîzm an jî Marksizm-Lenînizmî iflas kiriye. Çi heyf hinek welatên sosyalist jî bi tiştîn ku dîkin, alîkariya derew û demogojiyen emperyalizmê dîkin.

Berê, wekî li gelek welatan li Kurdistanê jî sistema sosyalist, şoreşgeren rizgarixwaz û netewî, serfîziyên pêşveçûna civakî, dibûn mîsalen baş ku bi huwiyyeta sosyalistî xebat were dayîn. Serpêhatiyen wan jî ji gelek aliyan ji me re dibûn ders. Berî ku em, li Kurdistanê hewcedariya sosyalistî, bi rastiyen welatê xwe ve bidin qebûlkirin, gelek caran me xwest bi destanên têkoşînen gelê dinê, başuya xwe bi gel bidin qebûlkirin. Dinavbeyna rîexistinan de jî, bûyer û rewşen şoreşgeren dinê bûn nakkîyîn herî mezin. Wisa bû ku gelek caran em ji meselaya welatê xwe, tarîxa xwe, problemen şoreşa xwe dûr ketin û di nav problemen navnetewî de fetisîn. Vê rewşen bi alîkî ve meriv kane bi bêjeya "nihîlizmê" bide navkirin.

Lî nuha me ev merhele paşde hiştiye û em bi dev an bi nîvî şâşîtiyên xwe yên berê qebûl dîkin. Lî nuha jî cardin gelek bûyer û guherandin li dinê dibin. Ji bo sosyalizma dinê û sosyalizma ku em dixwazin di pêşeroja Kurdistanê de damezîrin, gelek serpêhatî û ders, di bûyer û guherandina de heye. Eger em bi tesîren bûyer û guherandinênu ku li dinê dibin an jî bi reaksiyonâ li dijî şâşîtiyên berê, xwe wek perçekî ji tevgera komunîst a dinê nefikirin û gora vê, meseleyen dinê munaqşe nekin, ez bawer nakim ku emê rola xwe ya sosyalistî karibin di meseleyen welat de jî bînîn cî. Çimkî, huwiyyeta sosyalistî girêdayî ye bi dîtinê li ser rewşa welat û ya dinê. Tenê bi gotina "ez li Kurdistanê sosyalizmê dixwazim" meriv nabe sosyalist.

Wexta ku em têkîliyên wezifeyen netewî û çînî bi çavekî sosyalistî munaqşe bikin, di warê Kurdistanê û dinê de gelek vatiniyên girîng ewê derkevin pêşîya me. Reva ji

meselan riya helkirina meselan nîne.

Ez bi xwe, ji revandina munaqşeyen bûyer û guhertinênu ku li dinê dibin xetereke neteweprestî dibinim. Û ev talûke ji bo perspektifên şoreşa Kurdistanê jî, kare ji gelek aliyan de tahîukeke mezin be. Û kesen ku bi navê komunîstî vê meylê diparêzin ez bawer nakim ku ewê bikaribin di wextek dûr û dirêj de huwiyyeta komunîstî biparêzin.

Sosyalistên Kurdistanê bûyin û xwe bi pîrsen Kurdistanê ve sînor-kirin gerek meriv ji hevdû ciyê bike. Li gor sosyalistan ne mumkûne ku wezifeyen netewî û çînî, wezifeyen sosyalistî û demokratikî ji hev were ciyêkirin. Ev perspektif, di navnetewîkirina pîrsa Kurdi de ji gelek wezifîn girîng derdixîne ber me. Di warê navnetewî de dîtin û pêşneyarênu li ser meselaya Kurdistanî cur be cur in. Amerîka, NATO, Parlamentoja Ewrûpa, enternasyonal Sosyalist, welatên sosyalist û hin dewletên Ewrûpî li gor bir û baweriyen xwe, an li gor hesabîn xwe yên rojane an dûr û dirêj politikaya xwe li ser mesela Kurdistanê êdî eşkere tînin holê û diparêzin. Tenê welatên sosyalist gelek pasîf û bi nermî li meselê dinêrin. Sosyalistên Kurdistanê gerek di vî warî de jî têkîliyên wezifeyen netewî û çînî, sosyalistî û demokratikî bi awakî hunermendî baş bixebeitîn. Li gor perspektifên demê kin û dirêj, li ser naveroka dîtin û pêşneyaran bi gelek titizî were munaqşekirin. Di warê welat de jî, li ser dîtin û pêşneyarênu ku, têkoşîna netewî û civakî ji pîrr aliyan aleqeder dîkin lazim e baş were munaqşekirin.

Em ji kîjan aliyî binêrin, cardin ji bo sosyalistên Kurdistanê rola wezifîn netewî û çînî, wezifeyen sosyalistî û demokratikî xwe baş rî dide. Yê muhîm ew e ku em bi mîjîyên xwe bifîkirin, xwe ji texlit û şablonan dûr xînîn. Iro sistema sosyalizma reel ber bi têkçûnê ve diçe, lî sosyalizma ilmî wek dîtina dinê hîn jî rast e û aktuel e. Alén sor li Romanyayê, li Almanya Rojhîlat, li Çekoslovakayê têni çîrandin û guhertin, navê komaran têni guhertin; li Afrika Başûr, li El Salvador, li Filipînê hêviyên nuh şax didin. Li Kurdistanê, li Filistînê hêviyên teze, rîçeyen xwe bera erdê didin. Rastiya iro ji sosyalistên Kurdistanê re têkoşîneke xurt û pêşketî, wek wezifeyeke herî muhîm dixe rojeyê.

Lawikê Berrîvanî

Her mîrxasek bi hawakî mast dixwe...

Herçî hêz û partiyen Kurd ên çep in qet şik tuneye ku "gişen" wan rojekê berî rojekê dixwazin ku "yekîtiyek sosyalist" çê bikin. Îcar yekîti jî wek ze-wacî ye; çawa ku zewac bi xwestin û dildariya aliyeke tenê nabe, divê her du serî jî ya dildarê hev bin ya jî bi kîmasî bi hev û du bîn serî... Hetta, gelek caran (ez nabêjim her tim, ji ber ku Kurd jî êdî hînekî hatine guherandin) bi qebûlkirina bûk û zavê tenê jî mesele naqede, divê malbatê her du serîyan jî li hev bikin.

Yekîti jî wisa ye, dema hinek bixwazin û hinek nexwazin nabe, divê hemû alî jî bixwazin. Ev şertê yekemîn e. Lî bê guman problema "yekîtiyek sosyalist" ne ev tenê ye, li gel vê, hin gelş, zahmetî û dijwariyên fîkrî, siyâsi, taktîki, destûri û pragmatîk û h.w.d. hene. Çareserkirina van gelşan jî karekî ne hewqas hîsa ye.

Mesela, yek dibêje: "Yekîti jî divê hin qaîde û prensîbîn wê hebin. Em bibêjin taximekî futbolê ne 11 lîstikvan bin, nikare dakeve sahê û topê bilîze. Lî gelek hêz hene ku bi qasî taximekî topê jî tune ne lê cardin jî dibêjin em 'rîexistin' ya jî 'partî' ne. Bi hêzen wiha re yekîti çê bibe çiye, çê nebe çiye?"

Yê hember jî bi zimanê topê bersîvî dide: "Avakirina taximekî laletayîn pirr ne zehmet e, li her bajarekî Kurdistanê bi dehan taximên wisa hene, ya muhîm di taximekî de hebûna lîstikvanen wek 'Madrona' ne"

Yekî din ji wir dengê xwe bilind dike, dibêje: "Tu generalekî bê ordî yî, ma ezê bi çiyê te re yekîtiyek çêkim?"

Yê hember jî bi termînolojiya eskerî lê vedi-gerîne, dibêje: "Birako, ku ordiya min hebûna çîma minê bi te re yekîti çêkira; tu jî zanî ku minê bi te re ilanîherb bikira."

Yekî din ku ji zû de deng jê dernakeve, di quncik de xwe kîriye kun, bi hêrs dibêje: "Tu hewqas sal e xwe 'hêz' û 'partî' dihesibînî, lî hîn programek te tuneye. Ma ezê çawa bi te re yekîtiyek çêkim?"

Yê hember jî bi zimanekî siyâsi dibêje: "Ez bi qurban, hema programa te heye te ci havil kîriye?"

Yekî din bi riya tercûmanekî, bi Tirkî bi tonekî ji xwe bawer dibêje: "Carê bi van hêzan re yekîtiyek çêkira; ji ber ku pirêwan li ber godt garnîtûr (yanî hişnayî wek pîvazên hişin, tirpê, xerdelê, pûngê, xas û bexdenosê û hwd) in."

Yê hember jî bi hawakî matmayî dibêje: "Ez bi qurbanâ serî, me ji te pîrs nekîriye ku li ber godt ci tê xwarin ya jî ci nayê xwarin, ev yek dikeve qada 'literatura' aşxançîyan. Dîtina te ya li ser 'yekîtiyek' çiye?"

Yekî din ku vê dawiyê tevî munaqşâ siyâsi bûbû bi dengekî nîzm gotina cîm'atê dibire, dibêje: "Geli hevalan bira qahr tê tunebe, li dilê xwe negrin ezzê tiştekî bibêjim. Bi dîtina min ji bo ku yekîtiyek baş û saxlem çê bibe divê her kes 'secera' xwe ya siyâsi bê kîmasî, bê dîbinvekirin, bi temamî û bi zimanekî fesih raxe ber çavan."

Li hember vê daxwazê ji nav cîm'atê yek dibêje: "Baş e, em karin 'secera' xwe ya siyâsi nuxte bi nuxte raxin ber çavan. Gelo tu yê jî karibî 'secera' xwe nişanî me bîdi? Û esas berî her kesî jî divê tu bikî... Çimkî yê ji xelkê dixwaze tu yî!"


Dawîya dawiyê jî yekî din ê ku heya nuha deng û his jê biliya bû, nedigot him û nedigot gim ji nişka ve dibêje: "ez bi xwe baş nîzanim, gelo em "yekîtiyek sosyalist" çêkin baş e ya jî yekîtiyek "millî-demokratik!..."

Belê, munaqşâ hêzen sosyalist, ji bo "yekîtiyek sosyalist" bi vî rengî "siyâsi" dom dike. Dibêjin her mîrxasek bi hawakî mast dixwe! Her wisa her mîletek jî li gor mustewa xwe gelşen xwe hel dike...

Êl û Malbatêt Kurd li Azerbeycana Rojava

- 2 -

Perwîz Cîhanî



ketiya Tahir Xan bû. Piştî kuştina Tahir Xan Kurden vî gundi bere bere kêm bûn û Ecem di dewsa Kurdan de têde bi cih û war bûn. Nehe jî li wê derê ku bexşdarî ye Kurda û Ecem tevíhev dijin.

Nehe serokatiya elâ Heyderî di destê binemala Tahir Xan de ye. Her wisa ku hate nivîsin elâ Heyderî ji ser destâ elâ mezin a Zilan e û di Iranê da navbenda wan û elâ Celalî û taifa Birokî ku ewane jî bi ser elâ Zilan ve ne, baş e.

Têbinî: Elâ Zilan eleke mezin û navdar a Kurmançê jorîn e ku gelek el û taşfet dî li ser ve elê ne. Ema nehe navê wê elê hinde nemaye, çun ew tise û elê ku bi navê Zilan nav û bang bûn, nehe bi xwe bûne el û her bi navê xwe tene naskirin. Di pêş de elêt Sipkî, Mirdesi, Kiki, Heyderî, Celalî û Birokî û hwd. Hemû bi navê elâ Zilan dihatin naskirin.

3- Taifa Birokî: Taifa Birokî dibe du destâ: Birokî û Qulikî. Her yek ji vanâ jî dîbin çend tire û malbat, weki Nemiri, Qafqasî, Amoyî, Mexsikî, Xidikî û hwd.

Birokiya niha li Iranê li dorüberê Pûldeşt û Şot û Qereniyê dijin û pişkek zor ji wane koçer in di rêka terşdariyê de derbasiyê dîkin.

Di şerê Yekem ê Cihanê de Biroka ji Urisatê hatine Iranê û ji wê jî çûne Kurdistanâ Tirkiyê û Sûriyê. Nehe jî pişkek zor ji Biroka li wan deran dijin. Hindek ji li Urisatê hene. Serokê taifa Birokî li Iranê nihe Adil Birokî ye. Hecî Caser û Eloyê Cebar jî serokatiya Qulika di dest da ne.

Taifa Birokî di tevgera Agri da rabûne alikariya şoreşvana û li ser qazancê wan şer kirine. Piştî şikessta tevgera Agri serokê wê taşfî, navê taifa Birokiyê Zilan kirin Birokiyê Milan da ku ji aşita rejetandinê rizgar bibin û nehine sewq-kirin. Nihe jî navê ve taşfî di defterê resmî de bi navê Birokiyê Milan hatiye ragirtin û di pênasikê wan da jî hê Birokiyê Milan tête nivîsin. Evê hindê, birek ji tûweşkar û lêkoler xelitine ku bi şâşî ve taşfî li ser elâ Milan dihejmîrin. Lî weki hate nivîsin taifa Birokî li ser elâ Zilan e.

Çun serdarê Makûye neşîya şikestê bide Tahir Xan, kete find û fêla û pilanek ji bû ji nav birin û şikesta Tehar Xan kêşa û nîveka wî û Huseyn Begê Takûri da alozî çekir û ew herdu berdena şer û cengê ku di vi şerî de Tahir Xan tê kuştin. Sitrana Sira Qeleniyê di barê vi şerî da ye.

Gundê Qereniyê ku niha şehrekî piçûk e, cihê sero-

Qeredere, Elend, Kotol û Lekstanê dijin. Pişka zor a elâ Milan koçer e. Ev elâ xudanê sinsila eşireti ya rîk û pêk e ku dibe du destâ bi navê Xelika û Mila. Ev herdu destâ li ser hev 11 taşfî ne bi van navan in: 1) Mendolekî 2) Şêxikî 3) Dodikî 4) Memikî 5) Omoyî 6) Xozoyî 7) Miroyî 8) Delayî 9) Qurdoyî 10) Keçeli 11) Gulikî.

Elâ Mila baştîrîn terşdarê ustanê ne û baştîrîn zozan ji di destâ wan de ne. Her yek ji taşfî elâ Milan serokêkî wan heye. Devoka ve elâ bînamî devoka Kurmançê qoçanê ye û zarê wan geleki rengê hev dide (helbet pişkek zor ji ve elê nihe di nav Kurmançet Qocanê da hene).

Elâ Milan di tevgera Agri da di pêşta li pişta şoreşvana bûn. Lî paşiyê li dijî wan xebitin. Di cereyana

Medrûmî ji bînanê pişka zor a kurdên Azarbeycanê li rîka teşdarî û werzkariyê dijin.

6- Taifa Şatoyî:

Ev taifa paşmayî yê elâ mezin a Şatoyî (Şadîlû) yê Qoçanê ne, ku di dewra padışahiya Sefewiyan Efşaran da bo Xorasanê hatine rejetandin û koçkirinê. Taifa Şatoyî nihe di nav elâ Mila da dijin û xwe li ser elâ Mila dihejmîrin.

7- Elâ Kurhesûnî:

Ev elâ li pişka zor a navçet Azarbeycana Rojava bi taybeti li navçet Qerenî, Kela Xoyin, Kotol, dorüberê Selmaz û Urmiyê dijin.

Kurhesûnî du destâ ne: Kurhesûnîyê Kurd û Kurhesûnîyê Ecem. Kurhesûnîyê Kurd bi Kurdi û yê Ecem ji bi Ecemkî xeber didin.

Kurhesûnî hemû bînae pişka zor a Kurdan peyrewê mezhebê Şafî ne. (bi tay-



Teşîrêsen Celalîyan

Komara Mahabadê de ji ev elâ hemû li pişta dimokratî bûn.

Elâ Milan gelekî ketiye jîr barê ziman û rî resim û orf û adetât Ecema û zimanâ Ecemî geleki kar li ser zimanê wan kirine. Ev yek ji bo ve hindeyê ku ewana cîran û hefsûyê Ecema ne û di gelek gunda da tevî Eceman dijin. Ji %30 devoka elâ Milan Ecemî ye.

5- Taifa Medrûmî:

Taifa Medrûmî taifeyek piçûk e ku di nav elâ Milan da dijin. Pişka zor a malen ve taşfî li gundê Axbaş navça Sukmenawa ser bi bajarê Xoyê dijin. Taifa Medrûmî ser bi elâ Takorîne. Elâ Takorî ji di navçet Çaldiran û Ozalp a wilayeta Wanê Kurdistanâ Turkiyê da dijin û ser bi elâ mezin a Zilan tene hejmarê. Taifa

beti Kurhesûnîyê Ecem yê devrûberê urmiyê)

Elâ Kurhesûnî pişka zor werzkar û terşdar in. Xasma Kurhesûnîyê Ecem di navçet da baştîrînê werzkaran tene hejmarin.

Berê serokê Kurhesûnî ê Kurd Mexso bû ku li gundê Mexînê navça Kotolê dima. Niha jî serokatiya Kurhesûnîyê Kurd di destâ wê bînamalê da ye. Lî serokê Kurhesûnîyê Ecem Hecî Neso bû. Devoka ku Kurhesûnîyê Kurd pê xeber didin rengê ci devokê navçet nade. Ev devoka pişka zor dicîte ser bi devoka Bahdinanî li bakuра Kurdistanâ Iraqê. Gorêkî ragihandinû mezinên ve elê, ev elâ ji navçeyeke bi navê Kurhesin ji Kurdistanâ Iraqê hatine Iranê. Ev devoka wan jî ve gotinê rast derdixe.

(Dom dike)

Prof M. S. Lazarev:

"Kurd Qurbana dîrokê ne"

Di 9'ê Çiriya Paşin ya 1989'an de Prof. M. S. Lazarev li Stockholmê hat seredana me û bi redaksiyona Armancê re sohbet kir. Em di vê hejmarê de vê sohbetê wek hevpeyvîn pêşkêşî xwendevanên xwe dîkin.

◻ **Armanc:** Xwendevanên Kurd te wek pisporeki pirsa Kurdî nas dîkin. Lî em zanin xebat û pisporiya te ne tenê di warê Kurdî de ye. Gelo tu dikarî bi tevayî li ser kar û xebata xwe agahdariyê bîdi xwendevanên me?

Lazarev: Nuha ez bêtir giraniya xwe didim pirsa Kurdî. Lî ger ez li ser warêni pisporiya xwe bîpeyivim; ew jî ev in: dîroka serdema nuh a Tirkiyê, dîroka nuh a Erba û Rojhilata Navîn, peywendiyê navnetewî di Rojhilata Navîn de, Pirsa Netewî li Asyayê û bi taybetî jî pirsa Kurdî wek perçek pirsa milî. Di İstituya Rojhilata Navîn de seroktiya grûbekê dikim. Grûb bi navê pirsên rajyonî (herêmî) e. Ev grûb li ser pirsên navnetewî ya Rohilata Navîn dîsekine. Di vir de ne tenê mesela Kurdî, pirsa Tirkan, Ereban, Farsan, Afganiyan, pirsa Azeriya li iranê, problemen etnîkî li Afganistanê, pirsa Asûriya li Iraqê û li Sûriyê û pirsa aqeliyeta Fileyan û pirsên din hene. Di grûba me de hin kes hene li pirs û problemen aborîyê, dîrokê û cografi ên Rojhilata Navîn dinêrin.

Lê ji bilî van hemûyan hezkirine min a taybetî jî dîroka Rûsî re heye û dîroka Rûsî xweş dizanîm, ji edebiyata Rûsî hez dikim û xebata min li ser edebiyata Rûsî û edebiyata Rojhilata Navîn heye.

◻ **Armanc:** Vê herêma ku hûn li ser xebatê dîkin, gelo gira niya mesela Kurd di nav van probleman de çiye?

Lazarev: Elbet di nav pirsên Rojhilata Navîn de pirsa Kurdî ya yekem e. Ev jî him ji nufusa wê û him jî hecma wê tê. Maneyek wê ya navnetewî jî heye. Di çareserkerîna vê pirsê û çerçewa wê de gelek pirsên din hene û ev pirs bi pirsên din ve jî girêdayî ne. Mese la Kurdan em bêjin nebêjin digihê Tirkiyê, iranê û welatên Ereban. Û tevî van hemûyan jî pirsek taybetî ye.

◻ **Armanc:** Pirsa Kurdî wexta bi pirsên din yên herêmî re bê muqayesekirin ci karekteristîkên wê hene?

Lazarev: Kurd bi hejmara xwe nufusa herî pirr in. 20-25 milyon in. Di warê hejmara xwe de Kurd neteweyekî herî mezin e ku di cihanê de bê maf e. Ji alî dîrokî, pirsa Kurdî 300-400 sal berê heye, berî netewen din wan dest pê kiriye. Di serdema nuh de pirsa

herî aktuel e ku hazirê teqandinê ye. Bi dîtina min hin perspektifê vê pirsê hene ji a Filistinî pêşdetir in. Pirsa Kurdî xwedi çarenûse ke serbixwe ye. Pirsa Kurdî ne problema nuha ye a rojêne pêş e.

◻ **Armanc:** Gelo meriv dikare vê tespitê bike ku mesela Kurd meseleyek wiha ye ku dijminê wî yê herî xedar in û li gel vê dosten wî pirr kêm in û tim xwe didin pas. Eger wiha be sebeba wê çiye?

Lazarev: Wexta Şerê Cihanê yê Yekem Lenîn li Swîsrê bû. Wi axaftinek li ber Yekîtiya Ciwanen Swîsrê kir û got: "Em ixtiyar in emê tu carî serketina şoreşa sosyalist nebinin." Lî di Oktobrê de ew bi xwe serokê dewleta Sovyeti bû. Wî nedidit ku pişti çend mehîn din wê bûyerên wilo derbas bibin ku şoreşa sosyalizmê wê bê meydanê. Lazim e em ne pesimist bin.

îro dijminen Kurdan gelekî xurt in, dosten wan kêm in, lî belê rewşa cîhana îro usa ye ku mumkun e tiştek çêbe.

◻ **Armanc:** Pirsa Kurdî li gor pirsên din mezin û giran e. Li gor giraniya vê pirsê meriv dikare bêje ku dewleten ku giraniya wan li ser siyaseta dînyayê heye -wek Sovyet û Amerika- politika xwe tespitkirine yan jî qîmet dane pîsa Kurdi? Eger nedane çima?

Lazarev: Pirsa Kurdî nuha di qonaxa prosesa emeliyatî da ye. Nuha tiştekî xuya nîne lê bes wê ev pîrs hel bibe. Konferansa Parîsê di vî warî de nefîca pêşin e. Li ba me Rûsa metelokek wiha heye: "Bi hechecikekî bihar nayê"

Konferansa Parîsê tesrek mezin li cihanê kir. Pişte wê li Stockholmê konferans sek wiha çêbe. Hêdî hêdî wê raya cihanê li ser Kurdan çêbe lê wê hinek dewlet nerehet bibin. Ci hukumeta Sovyet, ci a Amerika û ci jî ya Fransa, İngilîstan alîkariya dewletek serbixwe ya Kurdan nakin. Ew ditîrsin ku peywendiyen wan bi Tirkiyê, İranê, Iraqê û Sûriyê re xirab bibin, ji bo van dewletan ev risk e. Ji bo ku van riskan telafî bikin wext divê. Lî Kurd dixwazin rojekê berê, ew alîkariyê bikin.

Mîzana ku di nav dewletan de ye divê Kurd pê zanibin.

ev, şâşîtiyê telefî nake. Lî nuha pêşveçûnek mezin li Sovyet çêdibe. Siyaseta derive di vî warî de destpêk e. Wexte dixwazin

◻ **Armanc:** Li ber çavê dînyayê ku behsa prensibên demokrasiyê, mefî mirovatiyê, aşitiya dînyayê, aşitiya herêman tê kirin, tevî wana jî gava miletekî pişük li ber çavê dînyayê di du seetan de kare bi çekên kîmyayî bê pelçiqandîn û tu kes jî dengê xwe na ke. Dînya wilô ye ku wexta meriv bahsa heqê xwe dike hinek radibin li meriv dixin û dînya dengê xwe neke. Di rewşa wiha de wê dînya cawa ber bi aştiyê ve here, wek yekî tarîxzan û pisporê miletekî pişük tu vana cawa difikirî?

Lazarev: Berî bersîva we bîdim, dixwazim meseleyekê bibêjim. Şoreşgerê demokrat ê Rûsî Çernîşevskî 25 sala surgunê Sibîrya bû. Prosesa dîrokî ne cadda Nevskî ye. (Nevskî cadeyek Moskova ye û dim û düz e.) Prosesa dîrokî bi zîkzak e.

◻ **Armanc:** Ku dewletek Kurda serbixwe di Rojhilata Navîn de çê bibe, bêje nebêje wê li çend dewletan tesîre bike û wê tesîr li wan be jî û ev risk e. Bas

e wexta li Kurdistanê bi hezaran ûnsan bi çekên kîmyayî bêng kus tin, bi milyonan bêng surgûn kirin, bi sedan gund bêng valakirin, tumafekî insanî yên wan tunebe, di demek weha de dema deng ji wan dernekeve risk di vir de di ku derê de ye? Mesela pîreka Sharov; Ele na Bonner di Konferansa Parîsê de got ku" gene we êrîşen çekên kîmyayî bîhîstîne, me di welatê xwe de xebara wê jî nebihîstiye" Ci risk heye ku merivên welatên Sovyeti vê qetîlamê bibîhîzin? Xanîma Mitterrand di Meclîsa Nûneran a Amerîka de got ku "mûyekî gelek zirav di navbera mesela têdaxulkirina nava karê dewleta û mesela mafî insanî de heye." Van iştan gelo meriv çawa izah bike?

Lazarev: Bi nîrîna min, ev çekên kîmyayî ku li Kurdistanê hatin bikaranîn û bêdengîya ku li Sovyet çêbû, şâşîtiyek bû. Herçiqas hinek kovaran babs kirin jî

Tişten ku nuha li Kurdan dibin bê raya gişî û Yekîtiya Miletan dibe. Ez li ser bûyerên ku bi tayebetî li Kurdistana Iraqê çêbûn protestoya hêzen Kurdan fahm dikim. Roja îro ku ev neheqî û heqaretên ku li Kurdan dibin ez baş fahm dikim.

Welaşen ku sinorêne me bi wan re müşterek in sebebê vî tişî ye. Ev sebebekî mezin e ku bêdeniya Sovyet çêdibe.

◻ **Armanc:** We got ku Konferansa Parîsê di mesela Kurdan de gavek pêş e. Ci rola Sovyetê di amedekekirina vê konferansê de hebû. Gelo Sovyet jî nafikire ku konferanseki wiha li Moskovayê çêke?

Lazarev: Xwedê zane! (dikene) Nuneren Akademiya ilmî a Sovyeti di Konferansa Parîsê de beşdar bûn, xeynî wan nuneren Kurden Sovyeti hatin. Mana wê ev e ku ne em bi xwe cûn Parîsê, hîneka em şandin. Di qonaxek teng de pasaport hazir kirin, vîze dan me, ev tiştekî muhîm e.

◻ **Armanc:** Tu bi xwe jî di Konferansa Parîsê de hazir bûyî. Bi dîtina te konferans çawa bû?

Lazarev: Konferansa Parîsê ji bo amadekekirina raya gişî ya cîhanê propagandeyek baş bû. Siyasetvanen welatên cuda cuda mecbûr in van tiştan berbiçav bînîn. Lî belê sewiya Konferansê bilind nebû, ji Sovyetê kesen siyasi nehatibûn, kesen siyasiyên ku hatibûn ne di sewiya bîlinde de bûn. Konferansê da xuyakirin ku Kurd bi xwe, yekîtiya wan a siyasi tûneye. Gelek grub hebûn. Rêxistînek wana wek PLO ya Filistinî tune bû, ku danûstendinê xwe bi Ewrûpiyan re deynin. Giraniya tevgera rizgariya Kurdistanê berî her tişî bi Kurdan ve girêdayî ye.

◻ **Armanc:** Serokê Kurdan li ser du tiştan rexne li Konferansa Parîsê dîgrin. Yek, mesela Kurdan meseleyek milî û mezin a 25 milyonî ye lê Konferans tenê bi navê mafî insanî û huviyeta kulturî hatlidarxistin. Gelek qels bû li gor problemen Kurdan. Netîca wê jî gelek nîz mîbû, rewşa realita Kurdan a îro neda diyarkirin. Meseleyek wiha mezin û gîring meriv bi çavekî pişük lê binêre, ew nikare bibe bingeh ji bo helkirina meselan. Noqta duduyan herçiqas Konferans Konferansa Navnetewî bû jî, lê Kurd wek berpirsiyaren xwe yên siyasi nehatibûn dawetkirin. Heger konferansen navnetewî wiha herin, daxwazîn rastin pêşniyâr nekin, wê nikaribin meselê hel bikin, gelo fikra we çiye?

Lazarev: Ev rast e. Tiştekî di cî de ye. Lî noqteyek heye ez dixwazim faktorekî dîrokî bînim bîra ve. Pişti Şoreşa Rûsan a 1905'an têkoşîna Bolşevîkan û Demokraten Rûsan di nav xelkê de hindik bû û hêzen siyasiyên esasî bi seroktiya Lenîn li dervayî welat bûn. Di wexta Şerê Cihanê ê Yekem de li hemû Rûsyayê 300-500 kes serbest hebûn, yên din yan di hefsan de bûn yan jî surgunkirî bûn. Pişti Şoreşa Sibata 1917'an li Rûsyayê bahozeck çêbû hêzen şoreşger gelek ber bi xurtbûnê ve cûn. Pişti çend mehan Bolşevîkan hukmet kir destê xwe.

mîlî bi gavên pişük dest pê dike."

◻ **Armanc:** Li Tirkîyê hînek rojnamevanan nîvîsîn ku Kurd dixwazin mesela xwe bi Rojava helbikin. Heta hinekan gotin ku Kurd ji nû ve bi mandateriya Amerîka û Fransa rabûn. Gelo ev rast e, Konferansa Parîsê wiha bû?

Lazarev: Na, ne rast e. Ew kesen ku li dijî Kurdan in dixwazin ku Kurdan li ber çavên Tirkan res bikin û bidin xuyakirin ku bêjin ev "listîka kesen derve" ye û qeweta xwe ji derive distînin, di çavên wan Tirkân nezan û ne intlegen de dixwazin şûra dijminayetiye çêbikin. Meqset ew e ku dijminayetiye di navbera Kurd û Tirkan de xurttir be.


Ji alî din, dîrokê nişan daye ku tevgera û rizgariya netewan di Rojhilata Navîn de ji alî tekîki ve muamele kirine ku ji xwe re dosîn derve bîbîn. Di wexte xwe de Stalin got ku "ji bo ku em zora Hitler bîbîn, em amede ne ku alikariyê bi şeytên re jî bikin." Meqseta wî Çorçîl bû.

Ci Amerîka, ci Fransa û ci jî İngilîstan li gor merfetîn xwe li pirsa Kurdan dinêrin, ev tişî jî normal e. Tişî muhîm ew e ku haya meriv ji meriv hebe. Meriv zanibe manewre bike.

◻ **Armanc:** He:a nuha ku mesela Kurd hel nebûye, qelsi û kîmasiyen wê çine?

Lazarev: Kurd qurbana dîrokê ne. Xelkekî perçekirî û di nav çar dewletan de ye. Ev rewşa objektif e û ji ber vê sebebê tevgera rizgariya Kurd nuha ne yekbûyî ye. Ji alî siyasi ve jî tevgera Kurd ji dehan partî û rêxistîn pêk tê. Ev partî jî ne di welatekî, di çar welatan de ne. Û ji alî armancen xwe yên siyasi jî perçe ne. Ji aliyê din mîlet ji alî aborî û kulturî paşde maye. Ne tenê partî û rêxistînen siyasi, bi tevayî mîlet li Kurdistanê paşde ye. Tişten ku li Ewrûpa dibin girêdanen wan bi tişten ku li Kurdistanê dibin re tunene. Helbet ev jî tiştekî normal e. Ez dixwazim faktorekî dîrokî bînim bîra ve. Pişti Şoreşa Rûsan a 1905'an têkoşîna Bolşevîkan û Demokraten Rûsan di nav xelkê de hindik bû û hêzen siyasiyên esasî bi seroktiya Lenîn li dervayî welat bûn. Di wexta Şerê Cihanê ê Yekem de li hemû Rûsyayê 300-500 kes serbest hebûn, yên din yan di hefsan de bûn yan jî surgunkirî bûn. Pişti Şoreşa Sibata 1917'an li Rûsyayê bahozeck çêbû hêzen şoreşger gelek ber bi xurtbûnê ve cûn. Pişti çend mehan Bolşevîkan hukmet kir destê xwe.

Bi dîtina min be-pîrsiyar û serokîn siyasi yên Kurdan gerek tecrubâ Rûsan baş zanibin. Kî zane pişti wextekê dikare gelek serpêhatin û guhertinê wiha li Rojhil-



Prof. M. S. Lazarev: "Tu dewletek piştgiriya şıara serxwebûnê nake, Kurd jî bi hêzên xwe nikarin wê pêk bînin". (Foto: Armanc)

atê jî çê bibin û Kurd jî karibin van bi kar bînin.

Armanc: We di axaftina xwe de di warê qelsbûnê de behs kir ku, partiyêne Kurdistan gelek in. Lê em dibînin miletêne gelek pêşde çûyî ji, wek Swêdî, Fransiz û hwd. gelek partiyêne wan hene. gelo ferqiyet çiye? Gelo çima ne tebî ye ku Kurd gelek partiyêne wan hebin?

Lazarev: Bila sed-du sed partî jî hebin lê hemû bi hev re ji bo armancekê bin û hedefen wan yek bin. Ez bi xwe wek lêkolînerekî ku li ser pirsan disekinim heta nuha ez nizanim ferqiyeta di navbera hêzên Kurdistan de ci ne. Çepen terorist û ewen rast jê derxe, lê evên din ez nizanim di navbera wan de ci ferq heye. Belki ez şas im, lê ev ferqîti ne ji şertên objektifî tê. Rewşa civata Kurd ew eku serokê Şikakan dibêje çawa eze serê xwe ji Barzaniyan re deynim yan yê Barzanî dibêje ezê çawa ji yê Talabanî re deynim. Ev ne súcê Kurda ye lê mirov kare bêje kultura wan a siyasi de se-wiyeq gelek nizm de ye û ji der-vayî irada wan e. Li Parisê, ji min pirsîn gotin, çend partî ji Kurdistan re lazim in? Min got partiyek tenê. Di vî warî de Filistin tercûbeyek e.

Armanc: Di Konfransa Parisê de we behs kir ku bi kemasî ji bo qonaxa iro realistir e ku Kurd dawa otonomiyê bikin ne a serxwebûnê? Gelo ji kijan ser-tan tu vê yekê realistir dibîni?

Lazarev: Di qonaxa pêşin de otonomî di çerçewa her welati de çêbe. Ev ji li ser taybetiya wan welatan e ku Kurd tê de dijin. Eger em rewşa iro bidin ber çavê xwe tenê otonomî mumkun e. Ji alîkî li her welatînu ku Kurd tê de dijin hukumetîn diktatorî hene; li Iranê di bin perda dînê İslâmî da

derketiye, li Iraqê nasionalîzma Erebî yan şovenîzm e, li Tirkîyê ji di bin perda şovenî de ye ku ji Ataturk maye. Li Süriyê diktatoriya Elewîti heye. Dîrokê nîşan daye ku rejîmîn diktatorî umrê wan kin in. Her roj kare rewş bê

Bila sed-du sed partî jî hebin lê hemû bi hev re ji bo armancekê bin û hedefen wan yek bin. Ez bi xwe wek lêkolînerekî ku li ser pirsan disekinim heta nuha ez nizanim ferqiyeta di navbera hêzên Kurdistan de ci ne. Çepen terorist û ewen rast jê derxe, lê evên din ez nizanim di navbera wan de ci ferq heye. Belki ez şas im, lê ev ferqîti ne ji şertên objektifî tê. her yek dixwaze ji xwe re serîki bikşîne.

guhertin. Iro em li vir rûnişti ne di eyîn wextê kare derbe li van welatan bibe. Di sala 1979'an de min li Kievê ders dida propagandan. Yekî ji min pirsî go wê rewşa Afganistanê çawa be, gelo wê leşkerê me têkevin Afganistanê? Min ji wan re got iro em û hûn bi hev re dipeyivin, kî zane belki iro yan ji sibê leşkeren me têkevin Afganistanê. Min tiştek ji nizanibû. Pişti ku ez ji Kievê ve-geriyam Moskovayê, serê sibê min di trêne de rojname kirî, min dît ku Sovyetê eskerê xwe şandibû Afganistanê. Paşiyê me bihist ku li Kievê gotibûn, ma-mostê Moskov bi her tişti zanin.

Di Rojhilata Navîn de di demek nêz de dice ku ji binî de rewş bê guherandin. Divê Kurd di guhertînu wiha de hazir bin. Lê di şerê Iran û Iraqê de Kurd bi wezîfa xwe ranebûn. Ez naxwa-

zim Kurdistan súcdar bikim lê wiha bû. Helbet Kurd problemen xwe bêtir zanin. Rehmetiyê Qasimlo di wextê xwe de gotibû, Rûs tişteki dinivîsin lê rewşa me tiştekî din e. Lê fakt fakt e, Kurdish mu-sade kirin ku rejîma Iran û Iraqê wan bi kar bînin. Derket ortê ku ev polîtika ne li menfeta gelê Kurd bû. Iranê piştgiriya Kurdên Iraqê, Iraqê piştgiriya Kurdên Iranê kir lê ev şansek tarîxî yê mezin bû ku Kurdish bi kar neanî.

Tu dewletek piştgiriya şıara serxwebûnê nake, Kurd jî bi hêzên xwe nikarin wê pêk bînin.

Armanc: We got ku çar welat piranî bi diktatorî tê idarekirin. Baş e, wexta ku demokrasî nehatibe van welatan, ma ev ne hendikapek e? Kurdên Iraqê ji 60'î heta 70'î ser kirin otonomî xistin destê xwe, pişti 5 salan dîsa ji wan hat stendin. Ji bo ku diktatorî bû, demokrasî tûnebû pişti wê disa Kurdish rahiştin çek û ser kirin. Wextê otonomî tê, meriv gerek dev ji çekan berde. Hergav pêşmerge li çiyan nabin. Meriv qanûna otonomiyê tesdiq dike. Lê ji ber ku demokrasî li van welatan tuneye, diktatorî pişti du salan dîsa mafê otonomiyê pasde distîn. Wê gavev wê ev çiroka Kurdish heta ku bimeşe. 20 salan ser dîkin, otonomiyê distîn, di pêy re disa pasde ji wan tê stendin. Tê xuyakirin ku heta demokarasiya rastîn neyê van welatan wê her wiha be. Yan ji wexta otonomî bê stendin divê DYAYA û Yekîtiya Sovyet bibin garantörê vê otonomiyê, ew ji nakin. Wê çawa be?

Lazarev: Him ji bo menfeeta Kurdish û him ji jo bo menfeeta hemû cihanî ye ku peywêndiyen di nav Sovyet û DYAYA de xweş bîbin. Hesabê vî tişti hemû cihan dike. Anqera, Baxdat, Tahran û Şam ji dike. Ev wê bibe derba objektifî ya mezin li dijî hemû şovenist û paşverûyen van welatan û wê Kurd û gelên din ji Feyde

bibînin. Di warê giştî de heta nuha Sovyet û Amerîka li diji hev tiş dikirin. Me di berberiya hevûdû de tiştek ji bi dest nexist.

Mesela ku Kurd ji şıara otonomiyê bêhêvî man, ez bi wan re me. Lî dîsa ji mesela şıara serxwebûnê kadastof e, eger otonomî nîvê-nîv kadastof be. Meriv kare berê miletê Kurd nedî otonomiyê, kare bide pêşveçûnê. Riya şoroşê girêdayî şertan e, ger ev şert hatin, meriv kare riya mîlet bide şoroşê.

Armanc: Ez dixwazim wek dîrokzanekî, li ser meselâ milî û miletan ji te bipirsim. Pişti Şoreşa Oktôber heta perestroyka yê nîzî 70 salî me digot li Sovyet, mesela milet û aqeliyan çareser bûye. Lî iro em dibînim ji Baltiqê bigre heya Asya Navîn, ji Kafqasya bigre heya Sibîryayê gelik milet û eqalîyet dengê xwe bilind dîkin, dawa heqê xwe dîkin. Gelo sosyalîzmê mesela wan hel nekiriye, ev tiştên ku ew dixwazin bi heqe yan neheq e?

Lazarev: Ez ji alî milî de Rûs im, lê bi dilê xwe Kurd im. Dîtinek min a taybetî li ser vê pirsê heye. Cibicikirina pîrsa milî pişti şoroşê tiştên pozitîv da. Şoreşa Oktôber di gelek warî de baweri-yelek bilind anî ku Marks, Engels û Lenîn dabûn ber xwe. Ev gelên ku Şoreşa Oktobrê birin serî û di şerîn ehlî de derbas bûn wek ava paqîj û saffî ya kaniyan bûn. Lî realîta jiyanî gelek kêm car bi dîtinê baş re li hev tê. Berî şoroşê Rûsya wek zîndana miletan bû. Şoreşa Oktobrê rizgariya hemû miletan anî. Her milet bi serbestî mafê xwe yê çarenûsî bi dest xist û qedera xwe tayîn kir û heta karibû ji Rûsya veqete ji. Ev mafê veqetandinê du miletan bikar anî: Polonya û Finlandiya. Miletê din ji her wiha meselân wan ê

Di warê pîrsa milî de Marksizmê got ku pîrsa çînî di ser her tişti re ye, lê tarîxê îspat-kir ku ev ne wiha ye. Mesela mafêni mirovi ji bi yê çîniyatîye ve hatin girêdan ku ev ji wiha derneket. Pîrsa ku şoreşa ilimî-teknîkî bi xwe re anî ev ji pîrsa hawîrdorê ye.

serxwebûnî hebûn lê ev meselân bi şerî ehlî ve gireshayî bû û dest-dirêjîn welatîn derve hebûn. Wek mîsal heta wextekê Azerbaycan, Ermenîstan û Gurcîstan wiha bûn. Lî di warê praktikê de ew bi wan welatîn ku destdirêjîya Rûsya dikirin ve hatibûn girêdan û li dijî Rûsya dihatin bikaranîn. Hêzên pêşverû, çîna karkir û zahmet-keshan hevkarî bi Rûsya re kirin û Yekîtiya Cumhuriyetîn Sovyetî danîn. Pişti serketina di şerî ehlî de ji bo wekheviya miletan û pêş-vebirina wan gelek tiştên mezin bûn. Gelek milet pir paşdemayıbûn, heta xwendin û nivîsandina wan û elfaba wan ji tûnebû. El-fabe ji wan re hat dayîn, mafê kulturî bi dest xistin, kadirîn wan ên intelîgent çêbûn û di warê ci-

vakî, edebî û kulturî de pêşveçûnek çêbû. Di nav milet û aqaliyeten paşdemayı de Kurd ji hebûn. Berî şoroşê di nav Kurdish de %1 zanibûn bixwînîn û binivîsin, ew ji mîr bûn, jin bê xwendin bûn. Bi van pêşketina meriv tenê kare serfiraz be. Miletê bindest û serokên wan wek Gandî, Nehrû kîf-xweş dibûn ku di welatê me de mesela milî hel dibe. Ev tiştên pozitîv bûn.

Pişti mirina Lenîn, Stalin yek-ser rejîmek diktatorî danî, Hesabêtu kesî û tişti nedikir. Ji bo ku bîr û baweriya wî weha bû; ku welatekî ji Sovyet çêke ji alî leşkerî û aborî ve di cihanî de herî mezin û xurt be û şertên xwe li ser herkesi ferz bike. Wî baweriya Marks û Lenîn di dîtinê xwe yên şexsî de bi kar anî. Hebûna yek partî, tunebûna muxalefeta hundir û dervayî partîyî imkan da ku ew rejîma xwe ya diktatorî xurt bike. Di warê mesela miletan de got hemû miletê Soviet yek dest in û divê di nava xwe de asîmle bibin. Di wextekê kurt de ew bîr û baweriyyen bilind ku Lenîn hil-dabûn, di destê Stalin de bi berevacî hatin bikaranî. Hemû daxwaz, tevger û hereketen milî wek tiştên nasyonalîst dihatin dîtin û dihatin pelçiqandin. Dostaniya miletan tenê di warê gotinan de ma. Hemû pîrsen netewî "pîrsen din li Moskovayê dihatin tespîtkirin û hel dibûn. Rûs "birayê mezin" bûn.

Bi dîtina min di warê netewêyan de her wiha şaşîti ji şoreşa okto-brê ji tê. Otonomî û serbestî li ser esasî mintiqan hat dayîn. Wek nuha tê xwiyakirin, pêwîst bû, otonomî û xweidarekirin li ser grûbîn milî û xelkî bihata danîn, ne li ser cografi. Dewleta Rûsya hîn berî şoroşê gelekî tevlihev bû, danûstendinê xurt di nav miletan de hebûn û pişti şoroşê ji têkili xurttir bûn ev xusûsiyeten Rûsya bûn.

Metelokek Rûsî heye "pişti şer, meriv zirta nade xwe, idî şer xelas bûye." Pêwîst bû li ser bingeha ku Sovyet hatibû damezrandin hemû mafê miletan bihata dayîn. Heger her milet mafê xwe bi dest xista û di bin sistemek demokratik de bijiya -ev sistem tu carî li Rûsya peyde nebû -wê çetir bûya. Bi baweriya min di çerçewa sistema iro de mafê Yekîtiya Sovyetan berdewambûnî heye, ji ber ku miletan wê gelek bi hev re girê dayîne. Ji alî dîrokî, kulturî, aboriya giştî ev wiha ye lê ji bo parastina vê sistemê pêwîst e di hemû warên jiyanê de reformen bingehîn pêk bêne.

Ji alî teorî de bîr û baweriya Marks û Lenîn serkeftinek bilind bû di wextê xwe de. Lî Marksîstan guhertînî mezin ku li cihanî çêbûn nedan ber çavê xwe. Marksîzm di sê waran de li paş ma. Di warê pîrsa milî de Marksîzmê got ku pîrsa çînî di ser her tişti re ye, lê tarîxê îspat-kir ku ev ne wiha ye. Mesela mafêni mirovi ji bi yê çîniyatîye ve hatin girêdan ku ev ji wiha derneket. Pîrsa ku şoreşa ilimî-teknîkî bi xwe re anî ev ji pîrsa hawîrdorê (çewre) ye. Ji bo ku perestroyka me bi ser keve pêwîst e van hersê noqtan bide ber çavê xwe.

Çirok

Gerrek li wê dinyayê

Bavê Nazê

Sofi Huseno, beri ku bimre, di ber xwe de, gotinê melan ên ku di terqînen xwe de li ser miriyan dixwendin, dubare kir. Hin ji wan gotinan ev bûn. "Hê filan kurê filan kesê! (Ji terqînen ev gotin bi sofi ne xweş dihat, tevî ku mele jê re rave dikir û digot; bi jinan nayê ewlekîr û ji ber vê yekê li ser tîrbê bi navê kurê dê, ne yê bavê gazî merovê mirî dikin) Wê Munkir û Nekir bêne ser te û ji te bipirsin: "Xwedayê te kî ye?" Tu ji wan re bîbêjî; Xwedayê min ê we ye". Ew ê bipirsin: "Pêxemberê te ki ye?" Tu ji wan re bêjî; "Pêxemberê min Muhemed e, selewatên Xwedê lê bin!"

Di vî warî de melan, di wa'zên xwe de digotin. "Heger merovê birewer bersîva xwe bi wî rengî bide Xwedê te'ale tirba wî dike taqek ji yên bîhuştê."

Sofi Huseno, pişti mirina xwe negîhişt ku çavê xwe veke, heya du res di nav rewrewkan de, li ber xwe dîtin. Berî ku ew jê bipirsin, wî bi xwe bi lez bersîva ku jiber kiribû da: "Xwedê min ê we ye û Pêxemberê

min ji yê we ye." Sofi Huseno di ciyê cî de, bi xwe hisiya ku di bersîva xwe de hineki xwe şas kiriye. Loma xwest li dersa terqînen vegere. Lîbelê her du resan rî nedanê û bi yek dengi jê pirsin:

-Tu ji kijan mîletî yi? Hindik mabû devê Sofi şas bîba û bigota: "Xwedê min ê we ye... Lî pêre-pêre xwe ragirt û bi şelaşî got:

-Hemd ji Xwedê re ez Musilman im...

Herduya disa bi hev re, lê belê bi hêrs jê re gotin:

-Em ne pirsa dinê te ji te dikin, em pirsa netewa te dikin. Xwe ehmeqşeytanî meke û bîbêjî!

Cilo Sofi di heyama telaban de jî ji pirsên wilô pişt kul bû, nuha jî wilô ji vê pirsê piştxûz bû. Di nava xwe de xurcili û tewirand: "Howeh! Heya li axretê jî pîrsa vî tiştî dikin!" Ji nişka ve, disa gotinê melan di guhêni wî de kîrin zingin: "Ereb, ji ber ku ji qewmê Pêxember in, ew çetirin qewm in li ser rûyê erdê..." Bi bîranina vê nîv ayetê, Sofi Husen seraser çû ser bersîva xwe:

-Ez ji qewmê Pêxember im.

Sofi negîha vê gotinê bîbêje, seraser ciger pê hat û heya hineki jî bi zirt got:

-Ew ci pirs in? Ma ne merovê Musilman hemû bira ne û ferq di nav wan de tuneye.

-Ma çima gotina din tu nabêjî?

-Kîjan? Sofi bi lez vegerand.

-Ferq di navbera Ereban û Eceman de ji bilî teqwayê, tuneye."

Sofi bi şelaşî got "Rast e xebera we ye". Ew disa kete qalibê xwe yê tîrsê.

-Lî Ereb û Turkan ferq dixistin nav xwe û birayên xwe yên Kurden Musilman. Ma ne wilô bû?

Sofi Huseno disa kete hev û nema zanibû ci bîbêje.

-Neyse, gotin herdu reşan, hineki bi nermayî:

-Tu ji kijan neteweyê yi?

Li gel ku pirs bi nermayî jê hate kîrin, lê zû bi zû sawa tîrsê Huseno berneda. Lîbelê gava ew bi xwe hisiya ku axaftin di nav wan de bi zimanê Kurdî ye, hineki xwîn pê de hat û bi awakî matmayî ji xwe pîrsi: "Ma ne melan digotin ku li wê dinêyayê Munkir û Nekir bi zimanê Erebî pîrsan ji miriyan dikin?" Kîlikâ xelkê dipîrsin û digotin: "Seyda, ma ne em cahil in û ji Kurmancî pê ve bi tu zimanân nizanîn, ma emê çîlo bersîva xwe bi Erebî bidin?"

Bersîva melan di bin basken wan de bû û rasterast digotin: "Xwedê te'ala zimanê bireweran digerine û ew dikarin bi hemû zimanân bîpeyivin."

Tevî ku Sofi Huseno xweş naskir ku her du res ji milletê wî ne jî, her ew zû bi zû li navê netewa xwe mikur nehat. Wî careke din bi cîv li wan vegerand:

-Yabo qurban, ez Musilmanekî Kurmancî im.

Li vira disa heyama teleban hat bîrê. Wan jî ne bê henek jê dipîrsin: "Pêşî tu Musilmanî ya ku Kurd i?" Wê çaxê jî Sofi bi konetî digot: "Heyran, ez ji herdu ya me."

Teleban ew bi riya wî de ber didan. Lî niha her du resan bi meqeresi didan pey pirsa xwe:

-Em cara dawî ji te dipîrsin: Tu ji kijan qewmî yi?

Tu rî li ber Sofi Huseno nema, ji bili ku bi yek gotinê bîbêjî:

-Ez Kurd im.

Bi vê gotinê tîrêjîn ruhniyê mina projektoran xwe berdan tirba Sofi Huseno. Heya destpêkê, ji ruhniya pîrr, wî bi desten xwe çavê xwe girt. Pişti kîlikekê, li dora xwe nîrî û dît ku her du merov li ser kabokan, li ber rûniştine. Sofi disa kete rewsek wiha ku nizanibû

ci bike. Lî her du kesan bi serçimandî, xwe bi xwe dilema xwe jê re dane naskirin û gotin:

-Tu seyidê me yî û Paşê Mezin em hinartin pêşîya te, da ku em rewşa welat û gel bi te bidin naskirin.

Sofi Huseno ji guh û çavên xwe bawer nekir, lê cardin jî wî di nava xwe de got: "Diyar e Xwedê te'ala rojî û nimêja min qebûl kîriye û ez bi bihiştê şâ kîrime".

Di ciyê cî de her du merovan bersîva gotina dilê wî dan û gotin:

-Na, ezbenî, em hatine pêşewaziya te, ji ber ku tu Kurd i.

-Subhanallah! Ji ber ku ez Kurd im? Bi awakî matmayî, bêje ji devê Sofi Huseno derketin û disa di nava xwe de got: "Loma meda digotin; Kesê ku li vê dunyayê ji tiştîkî mehrûm be, li axretê Xwedê te'ala, wî bi wî tiştî şâ dike."

-Ji kerema xwe re, ecele meke! Emê her tiştî di wexte de ji te re bêjin.

Bi gotina xwe her du kesan işaret dane Sofi da ku ew ji tirba xwe ra be.

Sofi Huseno bîdeng, da xwe û derket. Her du merov ji bi tengala wî ketin û dan ser riye dirêj û fireh. Li ser her du aliyen rî avayî li ber hev reqifandi bûn. Rûniştvanen wan, ji sîakan dihatin dîtin. Ji Sofi Huseno hate xwiyakîrin ku hin avayî wek dehla ne û hinê din jî mina dukanen quesaba ne, lê laşen merovan di wan de hilavisti bûn. Hin ew negîha bû di xwe de bixurcile, her du merovan jê re gotin:

-Ezbenî, nuha emê ji te re her tiştî bi riya xwe rave bîkin. Berî her tiştî pêwîst e bê gotin ku li welatê me wekhevî li ser hîmîn kar û xebatê merovan çebûye.

"Wekhevî li gora kar û xebata merovan..." Sofi Huseno ev gotin di ber xwe de dubare kir û ji xwe pîrsi: "Gelo berî nuha min ev gotin ji kî bîhîstibûn?" Sera-ser hate bîra wî ku komunîstan wilô digotin.

-Rast e, li dinya berê komunîstan wilô digotin, -her du merovan bi hev re ramana Sofi bi lêv kirin. Wan bi xwe jî nîrîna xwe li ser vê yekê dan berdewan-kirin:

-Zimanê wan ji gazeke direjtir bû, lê desten wan ji bo kar û xebatê ne dilebitin. Loma jî cezayê wan li cihana me ev e: bi gotina xwe, wan berî Sofi dane avayîyeke mişt xelk ku hemû jî ji zimanen xwe dalîqandî bûn, -binêre ji ber derewan ew bi zimanê xwe hilavisti ne.

Sofi Huseno bi çavê heyre li wan nîrî. Û ew ji darekê ket, pêla ku Şêxê terîqa

xwe jî di nav komunîstan de dit. Wî bi awakî matmayî pîrsi:

-Şêxê min û Komunist? Ew û mulhid?

-Finas û gotinê wî jî ne wek hev bûn, -gotin her du merivan ji Sofi re- Loma jî dibêjîn mîhî bi nigêna xwe û bizin bi nigêna xwe, kes na-keve tirba kesi...

-Ji ber vê yekê ji me re digotin; "Bi ilmê mele û şexan bikin, lê bi siilê wan mekin!" Sofi wilô got û berê xwe bi jor ve kir û bang kir: Ho Xwedêyo, ji xeynî te kes bi dilê insanan nizane!"

Ma bîdeng, pişt re ji nişka ve ket bîrê ku li dînyayê ew li ser riya heqiyê bû, vî tiştî hîşt bêtir ew ji xwe ewle be.

Dîmeşîya û di xwe de derdixist ku nigêna wî li ser erdeki hişk e û pişta wî li çiyayen bilind e. Edî wi gavê xwe bi awakî azayî avetin. Pê re jî serê xwe bilind kir û bi çavşorî awirê xwe gerandin. Ku gava çavê wî li çend cendirmân ket, di cî de çerisi û ji qidûm de ket. Bi awakî alavî destê xwe avet serê xwe da ku kumê xwe bi şeqqê biguhere.

Bi xwe cendirme ew cendirme bûn ên ku carekê li ser riya bajêr pêrgî wi bûbûn, wê gavê ew negîhabû ku kumê xwe bi şeqqê biguhere. Cendirman, destmala li dora kum vekiribûn, xistibûn hustiyê Sofi Huseno, çend sîle pê ve danibûn û mina kerê, li pey xwe kışandibûn. Bi tinazi jê re gotibûn. "Eşek oxî eşek, madem tu naxwazî şeqqe bidî serê xwe, emê jî hefsar têxin hustiyê te!"

-Ezbenî, niha tu dikarı tola xwe ji van cendirmen Turkân bistîni, herdu peyayan berê xwe dane Sofi û jê re gotin.

Sofi negîha tiştîkî bîbêje, hew dit ku çawîş bi cendirmen xwe ve, bi rişme ne û li ser çogan li ber wî ne.

-Tola xwe bistîne!

-Ya sitar!

-Binêrin, -gotin her du merovan ji cendirman re binêrin ci giyanê merovê Kurd mezîn e! Ew li xwe danyane ku destê xwe bi we gemarî bike...

-Ya sitar! Cendirme û ev hal?

Bi vê pirsa tîrsê Sofi Huseno di nav nîvînan de veciniqî û ji xewa xwe şiyar bû. Dema têgîhişt ku ev tiştîn nuha pê re derbas bûbûn, hemû xewn in, bi dengekî bilind eşheda xwe anî. Gava careke din li xewna xwe vegeeria, hemdê Xwedê kir, ku destê xwe li cendirme bilind nekir. Ma ne li gora tefsîra xewnan, esker di xewnan de weliyên Xwedê bûn.

Klasikên me

SEWADÎ

Abdulreqîb Yusif

Sewadî şâ'irekî Kurd ê hêja û berkeftî ye û yet ji wan şairên me yên sedê hijdeyê ye, wekî Axayokê Bidarî û her wisa -wekû hizir dîkin- **Batêyî û Mela Mensûre Girgaşî û Selîm** xudanê **Yusif û Zelîxa** bi Kurmanciya jorî. Sewadî xudanê kitêba **Leyl û Mecnûn** e. Bi Kurmanciya jorî di vê kitêba xwe ya berketî da çaxê xwe diyar kiriye, cûnkî têda tarîxa destpêkirina vê kitêbê diyar kiriye ya ku sala 1172 Koçî (1758/1759 zayînî) ye û yan 10 sal pêsha wê yan sala 1162'yê Koçî, cûnkî "Megezsine" her wekû di hindek denkê **Leyl û Mecnûn'ê** û yan "Mexezsine" her wekû hindek denkê wê yên tir da kiriye tarîxa danîna wê, wekû dibêje:

Neh rojî temamî paşê Newroz
Em bûne bi dil edîm û endoz
Mexzê dev û lêv û se'iyê sîne
Tarixî ji lew ji Mexezsine

Em nizanîn Sewadî xelkê ci cihekî ye û çawa jiyaye. Yanî em tiştekî derbara serhatiya jiyana wî nizanîn. Hetta navê wî jî nizanîn ci ye, tenya kitêba **Leyl û Mecnûn** li Yekîtiya Sovyet bi navê **Harisê Bidlisî** ve hatîye çapkirin, itir ne dûr e Haris navê wî be û xelkê Bidlisê be. Eger ew xelet nebûbin, navê Haris di kitêba wî de nehatîye. Tenya naznavê Sewadî di hindek malikan da têye, her wekû di her sê denkê vê kitêbê yên destnîvis, yên li nik me heyî.

Her kesêk vê kitêba wî bixwîne dizane ku şâ'rekî baş bûye û hizir dike ku dibî hindek helbest (qeside) jî danîbin û yan dîwanek ya şî're jî hebê. Belkû Sewadî bi xwe taflîya xwe bo vê yekê dirêj dike, di vê helbesta xwe de ya ku vê gotarê de belav dîkin û her wekî dibêje:

Bê misal im, delil im ger ci bit rexbet zelîl im,
Her li halê xwe delil im, beyt û dîwanê di min

û yan wekû:

Bê misal in bê 'edîl in, ger ci bit rexbet delîl in,
Xweş li halê min delîl in, beyt û dîwanê di min

Di vê heyva Tîrmehê de birader **Wesfi Ridînî** di rojnama Iraq jimara 36'an da helbestek belav kiriye û dibêje: "hêvidar im her kesek bizane helbesta ci şâ'rekî ye bo me diyar bike û me agahdar bike". Ji ber vê yekê em vê gotar û helbestê belav dîkin. Cûnkî ev helbeste ya Sewadî ye û sê denk jî nik me heye. Yek 12 malik e, ya tir 18 malik e, lê her du ne temam in û xeletî û pêş û paşî di wan de heye, wekû ew denka birader Wesfi belavkirî jî bitir xeletî têda hene û gelek ji hev çûwe û ew jî 12 malik bû, ji ber vê yekê em denika sêyê ji vê helbestê (qesideyê) belav dîkin, ya ku 30 malik e û rêk û pêk e tenya lengî li du-sê malikeyek da heye herweha baştır e ji hemîya cûnkî navê Sewadî di malika du-wahiyê de heye. Ev denke çend carek ji aliye **Seyid 'Ebu-lezîz 'Elewî** ve hatîye xwendin ji istiga(radyo) Qesra Şîrin û bi dengê wî li nik me heye. Ev helbesta Sewadî rewan û xweş e û destpêkirina wê ji xoştîrin destpêkirinê helbestenê Kurdi ye û eva he deqa wê helbestê ye:

Ey felek dîsa te kul kir
Derd û êşanê di min
Mislê bilbil, meylê gul kir
Aho, efxanê di min

Bê misal û bê 'edîl in
Ger ci bit rexbet delîl in
Xweş li halê min delîl in
Beyt û dîwanê di min

Gah û bêgah eşkera ne
Her di nêv qewmê mela ne
Mislê rojê pir celane
Xal û nişanê di min

Sinbil û rîhan bi noş in
Etles û dîba dipoşin
Subh û gahan pir xuroş in
Bax û bostanê di min

Ety dilo carek nehatî

Şeker û ava nebatî
Saqîya ava heyatî
Tê ji zozanê di min

Kofiya berqê di ber da
Xeml û rişî çûne ser da
Kê li halê me xeber da
Dax û kovanê di min

Derdê esqê pirr ezab e
Sotime ês û 'itab e,
Lê belê hisn û sewabê
Ew li cem yarê di min

'Isqê ser ta mitihane
Kî ku di hiş lê nemane
Ez dibim pir dermane
Ew li ser qelbê di min

'Enber û bêna gulavê
Çîçek û rîhan di navê,

Her seher têne silavê,
Aho, kovanê di min.

'Enber û bêna buxurê
Rohniya Sîna û Turê
Min cu car naçin ji bîrê
Hur û xilmanê di min

Milkê Misrê birc û eywan
Bax û cinnet hurî rizwan
Ey semayê mahê seyan
Text û dîwanê di min

Hur û xilman pir hiwane
Peşheta wan nêrgizane,
Daîma qelbim giran e
Bilbil û baxê di min

Bilbil û bazê dixwînin
Car û car serxoş dimînin
Aşiqan rençê dibinîn
Aho, hewarê di min

Ey dilo bêje tu awazan
Bi wan fikir û niyazan
Têkelî şîran bi sazan
Muhabet û 'isqa di min

Ey Sewadi bes bibêje
Pesheta 'isqê dirêje
Befr û baranê merêje
'Ewr û nîsanê di min

Ev nîvisa Abdilreqîb Yûsif ji
kovara **"Beyan**, 67, Kanûnî Yekem, 1980, rûpel, 87-88" hatîye
girtin. Bê ku em guhertinekê tê
de çêkin me ji herfê Erebi
wegerand herfîn latinî.

Hindik-Rindik

Büyera balkêş

Serokkomarê Tîrkiyê yê kevn Kenan Evren pişti te-qawutbuna xwe bi rojnamevanan re civinek çedîkir. Rojnamevanekî jê re got:

- Di van 9 salen serokkomariya xwe de te gelek wela zîyeret kir in. Di van ziyaretan de gelo tu râberi bûyareke enteresant bûyiyan na?

- Erê, ez bum. U ez vê yekê ji qet ji bir nakim. Di zi-yareta xwe ya Ingilistanê de tişte ku pîrr bala min kişand ev bû: hemû hemalên wan bi ingilizi zanibûn. Lî ji heyeta me bêyi tercuman, yeki ji bi ingilizi nizanibû.

Baqiltir

Jinike ji cirana xwe re got:

- Ez dibejim mirîşkên res ji mirîşkên sıpi baqiltir in.

Ciranê got, "çîma?"

- Ji ber ku mirîşkên res dikarin hêkên sıpi bikin, tê mirîşkên sıpi nikarin hêkên res bikin.

Sertên endametiye

Yeki Kurd li Sûri dixwaze bibe endamê Partiyê. Yê mesûl jê re dibêje:

Hevalo, divê ji iro û pé ve tu bi kaxeta nelizi, araqê venexwi û cixarê nekşini. Li ali din divê tu li hember partiyê comerd, fedekar û li hember hevalen xwe ji nefspicûk bi. Wezife û bîryarên Partiyê, divê tu bê qeyd û şert, yekê neki dudu, bi ci binî. Heta, ku rojke bê û biqewime, divê tu bi dilşadi karîbi canê xwe ji ji partiyê re biki qurban.

Li ser vê axaftinê yê Kurd dibêje:

- Hevalo, pişti ku ezê nelizim, këfekê nekim, araqê venexwim, cixarê nekşim, ma caneki wiha ezê ci bikim jê? Hema bîra ev can bi qurbana te û partiyê be.

Amadekar: Zinarê Xamo

Konferansa multeciyê Skandinavî



Serokê Komsîrê Multecîya yê Netewê Yekbûyî Thorvald Stoltenberg

wên Yekbûyî Thorvald Stoltenberg got ku "Em alikariya multeciyê Kurdistana Iraqê ku nuha li Tîrkiyê dimînin dîkin û di pêş de ji emê alikariya xwe zêde bikin"

Ji bo ku pirs û pirsgirekên multecîyan kêm bibin û nijatperestî di welatên Skandinavî de hîn geş nebe Konferansê pêşniyar kir ku, divê xebatên komelên biyanî bi komele, dezge, muesesên van we-

latan re û ya herî girîng jî peywendiyê wan bi civatên Skandinavî re hîn xurtir bibe.

Konferans rûmet da aktîfbûna Kurdên welatên Skandinavî û bi taybetî jî Kurdên ku li Swêdê dijin. Di dawiya Konferansê de bîyar hat stendin ku heta du salan konferanseke navnetewî li ser pirs û pirsegirekên multecîyan li Swêdê çêbe.

Deyîrê ma

Arêkerdox: Malmisanij

FATİMA (1)

Êre wo, rojawan o.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Êre wo, rojawan o.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Fati şiya serdê eyniyan o,
Day day, leyro; leyro, leyro.
Fati şiya serdê eyniyan o.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Cêr o yeno qufley (2) aşikan o.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Cêr o yeno qufley aşikan o.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Ay vernî (3) Husê Aşikan o.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Ay verên Husê Aşikan o.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Hus sitilanê (4) mi ronano.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Hus sitilanê mi ronano.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Çengilê mi gêno radano.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Çengilê mi gêno radano.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Mi beno Miyerron'î (5) miyano.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Mi beno Miyerron'î miyano.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Mi beno Key Mihê Kalan o.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Mi beno Key Mihê Kalan o.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Key Mihê Kalan dikan o.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Key Mihê Kalan dikan o.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Va: "Mi rî dira ki fistananê
îpegano."
Day day, leyro; leyro, leyro.
"Mi rî dira ki fistananê
îpegano."
Day day, leyro; Fatimay mi.

DİLİM DİLAN (1)

Dilim, dilim, Dilan a;
Dilim, dilim, Dilan.
Dilim, dilim, Dilan a;
Koçera mi b' heyran.

Lê, dilima mi vinî biya,
Dilim, dilim, Dilan.
Lê, dilima mi vinî biya,
Koçera mi b' heyran.

Ez geyraya, mi nêdiya;
Dilim, dilim, Dilan.
Ez geyraya, mi nêdiya;
Koçera mi b' heyran.

Mi kerrî (2) ver di diya,
Dilim, dilim, Dilan.
Mi kerrî ver di diya,
Koçera mi b' heyran.

Kerre hamewo (3) ser da,
Dilim, dilim, Dilan.
Kerre hamewo ser da,
Koçera mi b' heyran.

Ya kewta, bin di merda;
Dilim, dilim, Dilan.

Va: "Fatê, ti roşî serê
sendalîyan o."
Day day, leyro; leyro, leyro.
"Ti roşî serê sendalîyan o."
Day day, leyro; Fatimay mi.

Va: "Hus axay serê
sendalîyan o."
Day day, leyro; leyro, leyro.
"Axay serê sendalîyan o."
Day day, leyro; Fatimay mi.

Çifte por qeyme (6) dano.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Poro çifte qeyme dano.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Mi rî vanî Husê Aşikan o.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Mi rî vanî Husê Aşikan o.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Serê Sermikîs'î (7) buxar (8) o.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Binê Sermikîs'î buxar o.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Hus nêweş biyo, xidar o.
Day day, leyro; leyro, leyro.
Hus nêweş biyo, xidar o.
Day day, leyro; Fatimay mi.

Fat şiya bede (9) diyaro (10).
Day day, leyro; leyro, leyro.
Fat şiya bede diyaro.
Day day, leyro; Fatimay mi.

1 Na deyîri heway vatisê yew Dêreyijî nusiyaya (Dêrey yew dewa qezayê Piranî ya).

2 qufle : qifle, ref, cergi
3 vernî : verên, ayo/ayo ki vernî di
4 sîtil : satil, helke, hilke
5 Miyerron (Miyerran): Yew nahîyeyê qezayê Palî yo, Dewleta Tirkîye nameyê Miyerron'î bedil-nawo, kerdo Arıçak.

6 qeyme : qayme
7 Sermikîs : Yew dewa qezayê Palî ya.
8 buxar : boxar, çaxıl, zigar
9 bede : bere, bider, bide
10 diyar : diyar, cor, ser

HESENÊ PÎREJMANÎ (1)

Lero, lero, lero, lero, lero! (2)
Lero, lero, lero, lero!
Lero, lero, Hesenê mi!
Day êre wo, rojawan o.
Day êre wo, rojawan o.
Yew veng yeno, yew veyn dano.
Yew veng yeno, yew veyn dano.
EZ nêzano ki ayo kam o?

Ma'lîm' dewday ma veyn dawo.
Ma'lîm' dewday ma veyn dawo.
Lajê Mehmedî ... (?) veyn dawo.
Dayê, maney mi qerfawo. (3)
Dayê, mi xu çokan o dawo.
Dayê mi xu çokan o dawo.
Mi veynday Baw (4) Ehmedî (5) dawo.
Mi veynday Baw Ehmedî dawo.
Va: -Hejê (6) ci yo, ci qewmiyawo?
Va: -Hejê ci yo, ci ciriyawo?
-Ehme, lajê to têl (7) dawo!
-Pito, lajê to têl dawo!

Hesê m' serê Cîhan (8) daro kevnar o (9).
Binê Cîhan daro kevnar o.
Sêlî (10) Hesê m' eşto kinaro.
Sêlî pitê (11) m' eşto kinar o.
Lero, lero, lero, lero!
Lero, lero, Hesê mi lero!
Day êre wo, rojawan o.
Day êre wo, rojawan o.
Yew veng yeno, yew veyn dano.
Yew veng yeno, yew veyn dano.
Şanê (12) dewday ma veyn dano.
Mi va: -Se biyo, ci qewmiyawo?
Mi va: -Se biyo, ci qewmiyawo?
Ci qewmiyawo, ci ciriyawo?

Heso, serê dewday ma yew bend o.
Binê dewday ma yew bend o.
EZ heş biyo, koyan a mendo.
EZ heş biyo, koyan a mendo.
Heywax lero, lero, lero, lero!
Lero, lero, cahîlê mi!

Hesê m', vewr varaya, zimistan o.
Vewr varaya, zimistan o.
Vewr dawo gîlê daran o.
Vewr dawo gîlê daran o.
Ne gelan (13) o, ne gêdan (14) o.
Çimê mi mendî bi imbazan o.
Heywax lero, lero, lero, lero!
Heywax, lero, cahîlê mi!

Hese, nîşanlı (15) menda keyberan di.
Nîşanlı menda key pêran di.
Hesra to menda mi gan di.
Hesra to menda mi gan di.

1 Na deyîri mergê yew xortê Pîrejmanî ser ra vajiyaya. Mi a zey vatisê yew Dêreyijî nuşti (Pîrejman û Dêrey di dewê qezayê Piranî yê).

2 lero : leyro, lero, lawo, lao, la, lo
3 qerfayış : qerifiyat, qerefiyat, qerfiyat, qerfeyış, qerfeyış, qurifiyat, visiyat

4 baw : bawo, bawi, buw, babî, buabî, bawk, bak, bakil, ba, pi, pér

5 Baw Ehmed : Namê bawkê Hesî yo.

6 Hejî (Heja Mihî) : Namê maya Hesî yo.

7 têl : teyl, telgraf, telqraf

8 Cîhan (Canî) : Namê yew qezayê Edena wo (Tirkî di: Ceyhan).

9 kevnar : verên, keyen, kehen, ke'an; kewir

10 sêl : laser, laşer

11 pit : put, tut, qecek, qecek, qic, qicek, qij, qijeck, gede, doman, domon

12 şane : şiwane, şwane, şone, şûne

13 gelan : ameyox, hameyox (Tirkî di: gelen)

14 gêdan : şiyayox, şeyox (Tirkî di: giden)

15 nîşanlı : nîşankerda, nîşankerde

GİDİYONO (1)

Daykê dayê, gidîyono, gidîyono!
Wilay bawo, derdê mi giron o.
Wilay kul daya mi binî caxon (2) o,
EZ tersena kul te de mono.
Daykê korê, -mi va- serê mi dejawo.
Wilay bawo, serê mi dejawo.
Wilay mi serê xwi pişto û ragêrawo,
Wilay mi serê xwi girot nî kerri ver o nawo.
Wilay mi derdê xwi nî kerri rî vawo,
Wilay bêwewo kerre helliywao.
Wilay dar û bire (3) kelimiyawo,
Ellay serîn mi rî lo çi nêvawo.

Daykê korê, -mi va- adirî Ellay bikwo key bawkî lo inî rindono!
Wilay bext û êqbal' ma rî tellî visto fekî rayerono.
..... biqedeynî miradono.
Wilay ti nêverdî inî serrono.
Wilay ti biqedeynî dorey aşmon û rujono (4).
Gidîyono, gidîyono, dâykê, gidîyono!
Derd û kulê mi 'Elî Werda Heydon o.

Daykê korê, binê hewser (?) lo ma dimon (5) o.
Wilay serê-binê hewser ma dimon o.
Wilay şino serê bonê key Datono,
Şina serê Hewrîkê Hewarono.
Nêdar keno (6) tixmey (7) Şiqay Rehmonlîyono.
Vecaw qifley tolazon,
Gelo qomo (8), hey bêrî bewnî, verê (9) kom o!
Wilay pêş û tê miyono.
Wilay toy (10) vonî Osmonî Aşikon o.
Wilay mi nêzona 'Elî Werday Heydon o.
Daykê, derdê mi giron o.

Daykê korê, wilay mi va binê hewser lo ma dimon o.
Wilay serê-binê hewser ma dimon o.
Wilay 'Elî Werday Heydon gêna
Wilay hewa (11) yeno porr û biskonî mi kay dono,
'Elî heyro, [ti] ino begonmîş nêbenî,
pey ra bewnî beşn û yordimey keynekono.
Daykê, derdê mi giron o.

1 Na deyîri heway vatisê Wisî Cimî (Yusuf Gezer) amey nuşti.
Wisî Cimî, hetê Palî ra, Qerebegon (Qerebegon) ra wo.

2 cax-i : persû, qeburxa, qarxa
3 dar û bir-e : dar û bir, dar û ber, dar û lem
4 ruj (ruej) : roj, rûj, ruwej, roc, rûc, roz, roci, roze
5 dimon : dûman, duman, dumon, dumo, dumûn, dumû, dimo, duy

6 nêdar kerdiş : nîdar kerdiş, bala xwi dayîş, dîqqetî rey di hewniyât, bi dîqqet ewniyât/nîyadayene, ewnîriyât, ewnîyât, hewneyât, hewniyât, howneyât, hoyneyât, honiyât, owniyât, owneyât, weyniyât, weyniyât, winiyât, wuniyât,


7 tixme: cawo nêramitewo ki hêgây ver di wo, cawo burewo ki hêgây ver di, tuxm

8 qom : qewm, qowm

9 verê : verîn, verên, verî, veryen, verye, virên, virê, viren

10 toy : tay, tayê, tayî, tayn, tay, tay, tan, toyn, tonî, toyê, tuy, tûn, tuy

11 hewa : hawa, va (hewa yeno : va yeno)



Adresa waştişî:

Jîna Nû Förlaget
Post Box: 240 12
750 24 Uppsala
Sweden

Li Ewrûpayê Newroz

Îsal jî wê wek salên buhû li her derêne Ewrûpayê Newroz bêne pîrozkirin. Hetta, pîrozkirina Newrozê waye di meha Sibatê de destpêkiriye jî.

Li Osloyê roja 16'ê Sibatê ji aliyê Komîta Piştgiriya Kurdan, li Trondheim (Norweç) roja 21'ê Sibatê ji aliyê Yekitiya Xwendevanêne Kurd û Norweçyian û li Bergenê (Norweç) roja 23'ê Sibatê ji aliyê Forum Çanda Kurdi ve Newroz hat pîrozkirin. Di her sê şevan de jî di gel hin dengbêj û komên govendê Şivan Perwer besdar bû. Di 6'ê Nisanê de jî li Stavengerê (Norweç) ji aliyê Komela Demokratik a Karkerêne Kurdistanê ve

Newroz wê bê pîroz kirin. Ozanê bi nav û deng Şivan Perwer wê di vê şevê de jî besdar dibe.

Li Îngilistânê, Komela Karkerêne Kurdistanê di roja 18'ê Adarê de Newrozê pîroz dike. Di şevê de Feqiyê Teyran, Emekçî û hin dengbêjén din besdar dibin.

Li Swêdê jî gelek komelein endamê Federasyona Komelêne Kurdistanê li gelek bajaran Newrozê pîroz diken. Wek her sal li Stockholmê Federasyon bi şeve-ke girseyî Newrozê pîroz dike. Şev, wê di 24'ê Adarê de bi besdarbûna dengbêjén Kurd, Ciwan Haco, Seid Yusuf, Cûdî, Necmedîn Xulamî û hin dengbêjén din li Solnahal-

len çê bibe.


Her di 24'ê Adarê de li Hambûrgê wê bi şeveke muşterek Newroz bê pîrozkirin. Şev, ji aliyê aligirêne PPKK, PDGK, PDK-Îran, PASOK, KSSE, UKSYE û HEVKAR tê çêkirin. Di şevê de Gulistan, Feqiyê Teyra, Gara, Diyar, Cotkar û komên govendê besdar dibin. Her wisa bi van dengbêjan şevek jî wê li Heidelbergê çê bibe. Şev ji aliyê aligirêne PPKK, HEVKAR û hin rîexistinê din tê çêkirin.

Bêyî van şevênu ku me bi navkirin li gelek bajaran Ewrûpayê, ji aliyê komele û rîexistinê Kurd Newroz wê bêne pîrozkirin.

□

Xacepirs

Amedekar: S. Rêving



nal"ên avê, ên binerd dibêjin; gava ji cihekî dûr avê bibin ser zaviya xwe, coyekî dikolin, binê coyê û her du rexên wê bi keviran digrin, serê coyê jî bi kevir û axê digrin. Li devera "Lice" jê re "Salaç" dibêjin. 2-a) Firina hellandina me'denan. b) Di çemên mezin de cihê derbasbûnê; av pan e, tenik e, meyav e û ne kûr e. c) Di Kurmancî de paşdecekek. 3-a) Kur ya keça mûrê jinêkê, ji jineke din. b) Axîn û nalîna di şînî û tazîyan de. 4-a) Du herfîn bêdeng. b) Têjîka xezalan. c) Kek. 5-a) Dîn, ayîn. b) Qezayekte bajarê Sérte. 6-a) Li Bahdinan û Hekariyê ji "paçık"ê re dibêjin. b) Wecih, sıfet, rûçik (berevajî) c) Reqemek. 7-a) Çem b) Navekî qîzan (berevajî). 8-a) Sembola perê Tirkî. b) Pirsiyarek (berevajî) c) Teyrek (berevajî). 9-a) Peyva ku piştî xwendîna ayet û sûreyen Quranê tê gotin. b) Belê, e (berevajî). b) Giyayek bînxwêş. 11-a) Peyva telefonê (berevajî). b) Vexwarineke serekî. 12-a) Kesê ku tîryakîye alkoleye. b) nexweşiyek (berevajî). c) Ne nêr.

Ceperast: 1-a) Kedkar karkir, zehmetkêş. b) Dewarek. 2-a) Gazeke Kîmyayî. b) Li Bahdinan ji bo nexwesiya "qebiz" ê dibêjin. 3-a) Dengê bayî. b) Dema bayekî bi hêz tê û dizivire, kaxez û pel û qîşen sivik bi xwe re radike, paşê ber bi ezmîn bilind dibe, babe-lîsk. 4-a) Sînonîmoke "hine", "qine" (berevajî) b) Mam (berevajî) c) Peyva gazîkirinê, yan ya ga-zindê ji bo kesenê nêr. 5-a) Xeyidî, enirî, turebûyî, b) Cihê mirov yan heywan, yan tirimpêl li ser diçin. c) Beyreq, 'elem. 6-a) Curek ji curêne kin-cen xemîle ku jinêne Kurd di dîlan û şahîyan de didin seren xwe (berevajî). b) Amîrek li metbaxan. 7-a) Rih, rîş. 8-a) Qewil, gotina ku mirov jê venagere. b) Zuriyet 9-a) Qebûlkirin, pejirandin. b) Cihê genim lê dihêrin.

Serejêr: 1-a) Koçer, kesê ku li cihekî ne bicih. b) Li Botan ji bo "qa-


Bersîva Hejmara 100'î

Ceperast: 1-a) Dimdim, b) Xatûn. 2-a) İla, b) lidûd, c) ho. 3-a) Mê, b) Sînê. 4-a) Aso, b) Sîyamend. 5-a) Sê, b) nav. 6-a) Betal, b) ar. 7-a) Eda, b) Erîvan. 8-a) Ke, b) Ekî, c) Îsal. 9-a) ib, b) Şip, c) Yar. 10-a) Rij, b) Ka, c) İro. 11-a) Avis, b) nav. 12-a) Baran, b) Çar, c) Pi.

Serejêr: 1-a) Diyarbekir. 2-a) İl, b) Edebî. 3-a) Mamosata, b) Jar. 4-a) êa, b) ep, c) av. 5-a) İl, b) Lékirin. 6-a) Misin, b) Rîş. 7-a) Diyarî. 8-a) Xûnav, b) Viyana. 9-a) Adem, b) Nasâ. 10-a) em, b) Narîn. 11-a) Ühûn, b) Rap. 12-a) No, b) derî, c) Kovî

Serokekî mîrxas û serbilind

Nelson Mandela



Nêzî bîst û heft sal û nîvan di zîndanê nîjatrestan de Nelson Mandela bû merovekî efsanewî. Wî tu caran serê xwe li hember dijminen xwe xwar nekir. Zîndan û işkenceyên zali-man ew ji tekoşînê dûr nex-istin. Nelson Mandela 11'ê Sibatê serbest bû lê belê dev ji hedef û armancê xwe berneda. Roja ku ji hepsê derket beyan kir ku ANC (Konseya Netewî ya Afrika) wê bi her awayî tê-koşina xwe bidomîne. Eşkere ye ku iro mafê gelê Afrika Başûr -mebest reşik in-ê hilbijartînê hebûna wê Nelson Mandela bîbûya ser-komarê Afrika Başûr.

Rola ku Nelson Mandela di rojêne dahatû de bileyize hêj ne kifş e. Xuya ye ku gelek hêviyên mezin jê têne kirin. Gelo N. Mandela wê bibe serokê ANC? Gelo ew wê bikaribe hemû hêzên gelê reşik bigihîne hevûdu? Bersîven van pirsan wê di rojêne dahatû de bêtin dayîn.

Nelson Mandela di sala 1918'an de li herêma Transkey ku warê gelê Xosa ye, hat dinê. Ew kurê serekê eşira Tembu bû.

Dema di sala 1940'ı de bavê Nelson Mandela xwest ku wî bizewicîne, wî berê xwe da, reviya, çû bajarê Johannesburg. Li vir bi Oliver Tambo (serekê ANC) re çû unîversitâyê û bû hi-qûqzan.

Di dawiya salên 1940'ı de Nelson Mandela bû endamê Komîta Rêvebirina ANC. Wî, di pêşdestin û guher-tina têkoşîn û xebatêne ANC'ê de rolek girîng leyîst. Ew di sala 1952'an de cara yekemîn hat girtin û deh sal ji besdarbûna xwe-nîşandanen siyasi dûr ket.

Di meha Adara 1961'an de Mandela kete illegalite-yê. Di sala 1960'ı de li Sharpville 69 reşik ji alî polisan ve hatin şehîdkirin. Ev bûyêr bû sebebê guher-tina têkoşîna ANC'ê. Heya sala 1960'ı ANC'ê baweriya xwe bi têkoşîna aşîfiyê di-anî. Lîbelê têkoşîna 50 salî tu fêkî nedabû û njadperest ji ya xwe daneketibûn. ANC di sala 1961'an de bir-yara têkoşîna çekdarî da.

Nelson Mandela di avaki-

rina Tira Netewî (Rêxistina çekdar) ya ANC'ê de cih stend û hîmî şerê çekdaryê avêt. Tira Netewî dest bi sabotajan kir. Armanc çav-tîrsandina sermiyanen biyanî bû. Ji ber mîrxasiya xwe

Mandela bû qurnefila reş û tîrsek mezin xiste dilê kar-bidesten Afrika Başûr.

Nelson Mandela di 5'ê Tebaxa 1962'an de ji alî îstîxbarata Afrika Başûr ve hatibû girtin

Bi Kurtî

Serokê SWAPO, Jam Nuyoma -ev 30 sal e ku serokatiya SWAPO dike- di 16'ye Sibat 1990'ı de bi hemû dengen parlementerên parlamento ya Namibya bû serokkomarê yekemîn. Jam Nuyoma, di avakirina SWAPO yê de (1960) ji cih girtibû. Namibya wê di 21'ê Adara 1990'ı de bibe komarek serbixwe.

Di 25'ê Sibatê de li Nikeraguayê hilbijartîna serokkomarî çebû. Seroka muxalefetê Violeta Chamora bi %55,2 reyan hilbijartînê qezenc kir. Daniel Ortega %40,8 rey stendin.

Rojnama Middle East Watch, raporek li ser Sadam û hukûmeta BAASê weşand. Di vê raporê de tê eşkerkirin ku hukûmeta Iraqê xelkê Kurd bi zorê ji cî û warêne wan radike û berê wan dide ciyên din. Rapor eşkere dike ku li Iraqê her roj işkence, nefikirin û idam berdewam e û kesen ku li dijî Seaddam têne girtin.

KM ya PKYS biryar girt ku madda 6'an a qanûna Esasi ya Sovyetî bê rakirin ku mafê pêşengiyê dide partiya komûnîst.

Li Komara Tacikistanê li xelkê êrîş da ser Ermeniyan. Nêzî 40 kes hatin kuştin û 80 kes jî birîndar bûn. Ji ber tevlîheviyê li paytaxta Tacikistanê idara urfi hat flankirin.

6 sal û 3 meh ceza...

Destpêk r. I

Û Awuqt Eren Keskin weha dom dike: "Kurd hene yan tune ne? Kurd zimanek e yan na? Gelo kesen ku li Tirkîye dijîn bes zimanê wan Tirkîye? Ezê taleb bikim ku ev pirsa han ji alî pisporan ve bê lêkolandin! Ü ji bo keşfê jî ezzê bajarê Mêrdînê pêşniyaret bikim!"

Ezê taleb bikim ku ev pirsa han ji alî pisporan ve bê lêkolandin!

êrîşen dewlatê de ne. Ji van Medya Gunesî ku heta niha 12 hejmarêne derketin, hemû jî hatin qedexekirin.

Xwedî û berpirsiyare kovarê ceza xwarin û hîn 15 mah-kemên berpirsiyare dom di-kin.

Kovara Vatan Gunesî an-cax 4 hejmarê wê derketin, him xwedîyê kovarê Rifat Selafi û him jî berpirsiyare kovarê Rifat Eroglu hatin

girtin.

Kovara Deng ku heta nuha 3'ê hejmarêne derketin ew jî hemû hatin qedexekirin. Berpirsiyare kovarê yê yekem Kamîl Ermîş, yê duyem Sedat Karakaş û xwedîyê kovarê Hikmet Çetin ji alî Mahke-mâ Ewlekariya Dewletê a Stenbolê ve hatin girtin.

□

Gotinê Ksenofonê Grêkî li ser Kurdan

Siyamendê Serti

Heger hûn dîna xwe bidin pêşgotinê pirtükê ku li ser diroka Kurdan derke-tine, bê guman hûnê pêrgî vê hevokê bibin: "Gelê Kurd, geleki pîr kevnare ye û navê wî di pirtuka "Anabasis" a Ksenofonê Grêkî de derbas dibe". Bi xwe vi tiştî hişt ku ez vegekim ser vê berhemê. Niha jî ezê gotinê wî yê derbarê Kurdan de pêşkeshî we xendevanan bikim.

Çend bêje, li ser Ksenofon bi xwe; wî di heyamê xwe de, wek niviskar û serba-zeki leşkeri deng dabû. Ew, sala 430'ı berî miladê li bajarê Atina ji dayika xwe bûye. Naşîti û xortaniya xwe, di nav ceng û şeran de derbas kiriye. Lê belê rewşa welat a ne xweş, jê re nebû asteng ew fêri ilmên din bibe. Ew şagirtê Sokrates bi xwe bû. Dûre, wî bi tenê biranîn li ser mamosê xwe nivîsand.

Sala 401'ê berî miladê ji welatê xwe dertê û besdari îkspêditsiya (rihla) leşkeri ya Qir dibe. Di vê geryanê de, Ksenofon li Varilon, di çiyayê Kurdistanê û Ermîniya re derbas dibe û di Deryaya Reş re vedigere welatê xwe.

Bi xwe pirtuka wî "Anabasis" li ser vê vegekê û netewen ku di herêmê de di nav wan re derbasbûne, ye. Gelên ku Ksenofon di pirtuka xwe de qala wan dike, yek jî gelê Kurd e. Navê Kurd di gelek rûpelên kitê-bê de derbas dibe.

Li gora ku akademik İ. Tolstoy dibêje; mirovê ku bixwaze diroka Kurdan a kevnare bizanibe, divê ew vegere ser rûpelên pirtuka Ksenofon. Niviskarê "Anabasis" derbarî Kurdan de wîlo dinivise: "Me carekê ji hin esiran, li ser welat û netewen deverê hin pirs pirsin. Hinekan jî wan destê xwe bi alî başûr ve kirin û gotin; Ev rî diçê Varilon. Riya rojhîlat diçê zozan-ciyê havingeha Çar. Riya

rojava diçê nik Midîyan. Herçî riya evraz, a ku çiya û çiya bi rexê bakur ve diçê, ew diçê nav Kardoxan. Bi gotina wan kesan Kardox çiyayı ne, mileteki şervan in û serê xwe li ber çar naçemîn".

Ksenofon dinivise ku carêk hêzhek leşkeri çû ser Kardoxan, lê kes ji wan sax venegeriya. Li gel wiha jî, serbazan biryar stendin ku ji çiyayê Kardoxan derbas bin, çimki esiran ji wan re gotin ku pişti welatê Kardoxan welateki têr, bi navê Ermeniya, tê.

Bi gotina Ksenofon welatê Kardoxan, pîr asê bû. Ü di warê çandîn û xwedikirina pez û dewêr de pêşketi bû. Alavên wan ji bironz bûn û bi vi tiştî jî ew pêş ve çûbûn.

Diroknivîs dibêje ku me di vegera xwe de, destdirêjiya Kardoxan nekir, da ku em wek rîwiyê dost di nav wan re derbas bibin. Lê teví wiha jî Kardoxan rû nedan me û heya carna bi keviran şerê me dikirin. Bi xwe çekên wan tîr û kevan bûn. Di bikaranina wan de, ew geleki şareza bûn. Carna Kardoxan bi tîren xwe mer-talân me qul dikirin.

Ksenofon dinivise dibêje her ku em di nav Kardoxan re diçûn, bêtir leşker ji me dihatin kuştin. Pişti heftiyekê, bi xesaretek mezin, em gîhiştin Ermîniya. Sedema xesareta me ji ber konaya Kardoxan û çalakiya çekên wan bû.

Tîşte balkêş di pirtuka Ksenofon de, ew e ku Kurdan di wê heyamê de, li serê çiyan agir vêdixistin û li dora wî distiran û dilan dikirin. Gelo wan bi ci hilgaf-tinê (munasebetê) ev tişt dikirin? Lê em dikarin tex-mîn bikin, ku ev rengek ji rengê şahiyen wan bû û herçî vêxistina agir li ser çiyan, ne dûr e ku ew ji ber ola wan hatiye. Dibe jî ku ev rengeki ji rengê ibadeta Kurdan bû.

Fîşa abonetiya Armancê

- Salek
- Şeş meh

Abonetiya salekê	
Li Skandinavya	120 Skr.
Li Ewrûpa	50 DM.
Li derveyî Ewrûpa	35 \$

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişînin. Fotokopya kvîtoya heqê abonetiyê û fişa jorîn dagirin li ser adresa jî me re bişînin.

Adres: P. Box 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgin

Dinya me nêzi 6000 000 000 000 000 000 kg, ango 6000 trilyon ton giran e. Mirov kane giraniya dinê wiha ji bifikire; eger mirov vê 6000 trilyon giraniyê li wagonên trêne bar bike û her wagon 20 ton be û ev trêna barkiri bi 100 km./h sur'et biçe. Yekî rawestiyayî divê nêzi 3 bilyon sal di ciyê xwe de raweste da ku hemû wagonên barkiri ji ber wî derbas bibin.

Em dizanin ku dinya me li dora rojê dîzivire û ew gera xwe di 365 roj û 6 seitan de temam dike. Dinya dema li dora rojê dîzivire di saniyekê de 3 mil(30 km) diçê.

Pişti 5 milyar sal wê roj vemire. Wê demê tu enerjiya rojê wê nemîne. Roj di saniyekê de ji kutla xwe 4 ton winda dike. Dema ku germa rojê biqede wê jê kutleyeke 200 car ji ya nuha mezintir peyda bibe. Dinya me ji wê bimre. Ev gühertina han helbet bi carekê nabe.

Pêvajoya vê bûyare wê 100 milyon sal bigre.

Kesên ku pir pîvaz, sîr û sîrimê dix-win zû bi zû bi nexweşîya kansera zik nakevin. Li gor lêkolinerên Çini pîvaz, sîr û sîrim rîska ketina nexweşîya kanserê kêm dike.

Mêjiyê mirov di navbera 14-20 sali de herî girantir e. Pişti 20 sali ev giraniya ha hêdi hêdi kêm dibe. Li dor 80 sali giraniya mîjî 90 giram kêm dibe.

Lawikên ku di wextê xwe de ji diyâ xwe dibin ji keçikan 150-200 giram girantir in.

İnsan di deqîqeyekê de ji çermê xwe 10.000 perçen piçük(partikel) davêje der. Ji van di nêzi 1000 perçan de mikrop(bakteri) hene.

Rojek di eslê xwe de 23 seet, 56 deqiqe û 4,103 saniye ye. Dirêjahiya salekê ji bi hesabekî tekûz 365,2564 roj e.

Jinên bi heml(bi zarok, ducanî) di sê mehîn pêşî de, di xewna xwe de gelek car beq, mar û çiçekên malê dibinîn.

Di nav 600 milyon salan de xweza (tebiet) 4000 milyon heywanen cur be cur afirandîye. Ji van iro tenê 1-2 mil-yon mane.

Weşanên Nuh

Me dema dest bi weşandina "Weşanên Nuh" kir, em di şikê de bûn ku gelo wê her meh weşanên nuh hebin? Maşallah! Edî ci bigre her meh li dor 9-10 pirtükên bi Kurdi an bi zimanên din li ser Kurdan derdikevin. Em nuha pê ra nagihîn. Me derbarê "Weşanên Nuh" ji xwendavnê xwe kritikên pozitif girtin. Heta ji destê me bê, emê xwe bigîhîn pirtükên nuh û bi xwendavanen xwe bidin naskirin. Lê problemech me heye, haya me ji hemû weşanên nuh çê nabe, çê bibe ji carna em xwe na-gîhîn weşanên nuh. Tika me ji xwendîye weşanxanan ew e, weşanên xwe yênuh li ser navnîşana me rîbikin ku em karîbin wan bidin naskirin.

DAL

Ev çirok-helbesta Şérko Bêkes di sala 1987'an de, dema li nav pêşmerga li serê çiyayê Kurdistanê bûye hatiye nivîsin. Xalid Xalid çirok-helbesta Dal (qertel, eylo) ji tipen Erebi wergerandiye tipen Latinî û bi riya têbîniya maneya hin bê-jeyen Soranî bi Kurmançî nivîsiye.

Şérko Bêkes helbestvanekî me yê bi nav û deng e. Lawê Fayiq Bêkes e, sala 1940'ı li Sulêymaniye ji dayik bûye. Li dor 10 pirtükên wî yê helbestan hene. Klûba PEN a Swêdê di sala 1987'an de Şérko Bêkes bi xelata Tucholsky xelat kir. Dal 44 rûpel e û ji aliyê weşanxana APEC ve di dawîya sala 1989'an de hatiye çapkirin. Navnîşana xwestinê ev e:

APEC Tryck & Förlag, Box 3318,
163 03 Spånga / Sweden

MÎRSAD-UL ETFAL (Amadegeha Zarûkan)

Ev pirtük ferhenga Kurdi-Farisi ye, ji 16 beşan û ji 320 beytan pêk tê. Têde li dor 1250 bêjeyen Kurdi û li dor 1150 bêjeyen Farisi hene. Ev pirtük sala 1912-1913'an hatiye amadekirin. Lê mixabin cara yekemin sala 1980'yî bi tipen Erebi-ku arjinâl bi tipen Erebi ye-hatiye çapkirin. Zeynelabidin Zinar ev pirtük ji tipen Erebi wergerand tipen Latinî.

Niviskarê pirtükê Şêx Muhammed Kerbelayî Bedruddin e. Ew lawê Şêx Ev-direhmanê Axtepî ye, di navbera salen 1885 û 1939'an de jiyaye. Pirtük ji aliyê Weşanxana Jîna Nû ve tevi orjinalê wê hatiye çapkirin. Pirtük tevi orjinala we 125 rûpel e. Navnîşana xwestinê ev e:

Jîna Nû Förlaget, Post Box 240 12,
750 24 Uppsala / Sweden

XWENÇE

Ev pirtuka han berhevoka folklorâ Kurdi ye û ji aliyê Zeynelabidin Zinar ve hatiye amadekirin. Berhevok ji sê beşan pêk tê. Beşê yekê gotinê pêşyan e û ji 615 gotinê pêşyan pêk tê. Beşê duyem kilam in. Di vi beşî de 70 kilam cî girtine. Beşê sisiyan hinek tevlî hev e. di vi beşî de çirok, büyerên dirokî, metelok, pêkenok hene. Di nav pêkenokan de hin pêkenokên ku li her civatê nayên gotin yênci jî hene. Li ser berga pêşî ya pirtükê "cild 1" hatiye nivîsandin û wek di pêşgotinê de ji tê diyarkirin amadekar li ser vê babetê wê hê ji bixe-bite.

Pirtük 278 rûpel e û ji aliyê Weşanxana Çanda Kurdi di dawîya sala 1989'an de hatiye çapkirin. Navnîşana xwestinê ev e:

Weşanxana Çanda Kurdi, Box 161 39,
103 23 Stockholm / Sweden

NAVÊN KURDÎ

Amed Tigris bi alikariya gelek çavkâniyan 1554 navên keçan û 1185 navên lawan di pirtükê piçük de bi navê "Navên Kurdi" amadekirîye û tevi pêşgotinê dirêj daye çapkirin. A. Tigris, ev pirtuka xwe diyarı "zarokan Kurd en ku nuh dibin û wan dê û bavênu ku dixwazin navên şerîn en Kurdi li zarokên xwe kin", kiriye. Pirtük 84 rûpel e û ji aliyê weşanxana APEC ve di sala 1990'ı de hatiye çapkirin.

Navnîşana xwestinê ev e:
APEC Tryck & Förlag, Box 3318,
163 03 Spånga / Sweden